

Dîmena Hiqûqî û Fiîlî ya Mafê
Hêviyê li Tirkiyeyê: Rejîma
Înfazkirina Sizayê
Hetahetayî yê Girankirî



TOHAV
Toplum ve Hukuk Araştırmaları Vakfı
Foundation for Society and Legal Studies

Dîmena Hiqûqî û Fiîlî ya Mafê
Hêviyê li Tirkîyeyê: Rejîma
Înfazkirina Sizayê
Hetahetayî yê Girankirî

Beşek an tevahiya naveroka vê weşanê, bi şerta ku çavkanî bê nîşandan, dikare were girtin û belavkirin. Hewce nake ku ji bo vê ji pêş de destûr bê wergirtin. Berpirsyariya hemû agahî û ramanên raporê aîdi Weqfa Lêkolînên Civak û Hiqûqê (TOHAV) ye.



TOHAV
Toplum ve Hukuk Araştırmaları Vakfı
Foundation for Society and Legal Studies

Amadekirina Raporê
Weqfa Lêkolînên Cîvak û Hîqûqê (TOHAV)

Wergêr
Remziye Alparslan

Sêwirandin
Ahmet Soykarci

Dîroka Weşanê 2026



TOHAV
Toplum ve Hukuk Araştırmaları Vakfı
Foundation for Society and Legal Studies

Weqfa Lêkolînên Civak û Hiqûqê (TOHAV) saziyeke civaka sîvîl e û bi wê mebestê hatiye avakirin ku prensîbên hiqûqê yê demokratîk û gerdunî di hemû qadên jiyana civakê û dewletê de bîn pejirandin û bicihkirin. Armanca Weqfê xurtkirina têgihîştîneke hiqûqê ye ku mirovan digire navenda xwe, wekhevîparêz e, beşdariyê esas digire û azadîparêz e; her wiha hêvî dike ku hayjêbûna civakî zêdetir bike û zemînên hevgirtinê berfirehtir bike.

TOHAV, di ber fealiyetên xwe yê lêkolînkirin, çavdêrîkirin û raporkirina di warên hiqûq û mafên mirovan de û fealiyetên xwe yê weşanê de, bi piştgirî û hevgirtina bi kes, kom û saziyan re xebatên hiqûqî, perwerdeyî û çandî jî dike. Bi hevkarîyên xwe yê navneteweyî dixwaze piştgiriya bide avakirina pergaleke hiqûqê ya li ser bingeha edalet, dadmendî û mafên mirovan.



TOHAV
Toplum ve Hukuk Araştırmaları Vakfı
Foundation for Society and Legal Studies

Ev rapor di encama pêvajoyeke kedayînê ya kolektîf de bi pevrefikirînê, nîqaşkirînê û hevqirtinê hatiye amadekirin û armanca wê ew e ku pirsgerêkên pîralî yên têkildarî rûmeta mirovan û mafê hêviyê zêdetir bîne ber çavan ku sedema wan rejîma înfazê ya Tirkiyeyê ya sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî ye.

Tesbît, nixandin û encamên vê raporê berhemeke xebata dezgehî ya Weqfa Lêkolînên Civak û Hiqûqê ye û hemû berpirsariya raporê aîdî Weqfê ye. Ji ber vê yekê, nêrîn û nirxandinên di raporê de divê ne wekî nêrîn an berpirsariyên şexsî yên kesên tê de ked dayî werin hesabandin.

Ev rapor, bi piştgiriya darayî ya ku ji hêla EuroMed Rights ve bi rêya fona bi navê “Bihêzkirina Civaka Sivîl ji bo Têkoşîna li Dijî Bêcezatiyê / NDICI-THE-NEAR/2023/449-257” hatiye amadekirin. Berpirsariya naverokê bi temamî TOHAV hildide ser xwe û dibe ku nêrînên fermî yên Yekitiya Ewropa û EuroMed Rights nîşan nede.

Em hêvî dikin ku ev xebat pişkdar û alîkar be di pêşvebirina nîqaşên li ser polîtîkayên sîvîl û înfazê de ku rûmeta mirovan di navenda wan de ye û zemîneke hevpar a fikirînê ava bike der heqê mafê hêviyê de.

NAVEROK

Kurtebêje	9
Kurte	11
Beşa Yekem: Ev Rapor Çi Dihewîne, Armanc û Rêbazên wê Çi Ne?	
1. Destpêk	14
2.Serzêdeyiyên Raporê û Pêşniyar	15
2.1. Serzêdeyiya Têgihî	15
2.2. Serzêdeyiyên Dîrokî û Hiqûqî	15
2.3. Serzêdeyiya Demokratîk û Civakî	16
2.4. Serzêdeyiya di Çarçoveya Tirkîyeyê de	16
2.5. Pêşniyarên Politîka û Reforman	16
2.6. Encam	17
Beşa Duyem: Bingehên Têgihî, Dîrokî û Normatif ên Mafê Hêviyê	
1.Mafê Hêviyê Çi Ye?	19
1.1. Çarçoveya Têgihî ya Mafê Hêviyê	19
1.2. Bingehên Dîrokî û Hiqûqî yên Mafê Hêviyê	20
1.2.1. Paşxaneyê Dîrokî	20

1.2.2. Belgeyên Hevdem ên Mafên Mirovan	21
1.2.3. Serzêdeyiya Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê	21
1.2.4. Bingehîn Normatîf	22
1.3. Giringiya Mafê Hêviyê ji bo Civakeke Demokratîk	22
1.3.1. Mafê Hêviyê û Girêdana Hemwelatîbûnê	22
1.3.2. Polîtîkayeke Sizayî ya Etîk û Standardê Hêviyê	23
1.3.3. Hêvi û Pêbaweriya Civakî	23
1.3.4. Hêvi, Guherîn û Rûmeta Mirovan	23
1.3.5. Xeta di Navbera Mafê Hêviyê û Otorîterbûnê de	23
1.4. Mafê Hêviyê di Peywenda Tirkîyeyê de	24
1.4.1. Rakirina Sizayê Mirinê û Derketina Sizayê Girtîgehê y Hetahetayî yê Girankirî	24
1.4.2. Birêkûpêkkirinên Hiqûqî û Derfetên Berdanê	24
1.4.3. Biryarên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê û Binbarî û Berpirsariyên Tirkîyeyê	25
1.4.4. Giraniya Rejîma Înfazê û Pirsgerêka Tecridê	25
1.4.5. Rexneyên Navneteweyî û Pirsgerêka Şefabûnê	25
1.4.6. Rehenda Civakî ya Mafê Hêviyê	26
2. Mafê Hêviyê di Hiqûqa Navneteweyî de	26
1. Bingehîn Dîrokî û Normatîf	26
1.1. Rakirina Pêbîpê ya Sizayê Mirinê û Pirsên Nû	26
1.2. Bingehên Normatîf ên Mafê Hêviyê di Belgeyên Navneteweyî de	27
1.3. Rûmeta Mirovan û Mafê Hêviyê: Teoriya Hiqûqê û Rehenda Felsefî	28
2. Pêşîneyên Dadgehî yê Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê:	
Avakirina Darazî ya Mafê Hêviyê	28
2.1. Biryara Kafkarîs/Kibrisê	29
2.2. Biryara Vînter û yê Din/Kraliyeta Yekbûyî	29
2.3. Biryarên li ser Tirkîyeyê	29
a. Biryara Ocalan/Tirkîye (No. 2)	29
b. Biryara Kaytan/Tirkîye	30
c. Biryara Koma Gurban / Tirkîye	30
d. Biryara Boltan/Tirkîye	30
e. Biryarên Din ên Giring	31
2.4. Standardên ku Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê di Behsa Mafê Hêviyê de Diyar Kirine	31
2.5. Hiqûqa Berawirdkirî: Sepandinên li Ewropayê û Modelên Cuda	33

Beşa Sêyem: Pergala Tirkîyeyê ya Sizayê Girtîgehê yê Hetahetayî yê Girankirî: Çarçoveya Heyî ya Hiqûqî û Kargêrî

1. Rakirina Sizayê Mirinê	36
2. Sizayê “Heta Mirinê di Girtîgehê de Man”ê: Xalên Kîrîtîk di Mewzûatê de	37
3. Kêmbûna Daneyan û Pirsgerêka Şefabûnê	38

4. Rejîma Înfazê ya Sizayê Girtîgehê yê Hetahetayî yê Girankirî û Bandora Abdullah Ocalan	39
4.1. Rakirina Sizayê Mirinê û li Şûnê Anîna Rejîma Înfazê ya Sizayê Hetahetayî yê Girankirî	39
4.2. Binpêkirina Prensîba Cudakarî û Wekhevîyê di Sepandina Sizayê Girtîgehê yê Hetahetayî yê Girankirî de	41
Beşa Çarem: Bandora Rejîma Sizayê Girtîgehê yê Hetahetayî yê Girankirî: Aliyên Wê yên Mafên Mirovan û Tenduristiye	
1. Bandora Rejîma Înfazê li ser Tenduristiya Psîkolojîk û Fîzîkî ya Girtiyên Sizayê Girtîgehê yê Hetahetayî yê Girankirî	46
2. Prensîbên Hiqûqa Navneteweyî li ser Tecrîd û Sizayê Hucreyê	47
3. Sizayê Girtîgehê yê Hetahetayî yê Girankirî û Mercên Ragirtina Girtiyan	48
Beşa Pêncem: Girêdarî û Sepandina Biryarên DMMEyê di Hiqûqa Navxweyî ya Tirkîyeyê de	
Girêdarî û Sepandina Biryarên DMMEyê di Hiqûqa Navxweyî ya Tirkîyeyê de	55
Beşa Şeşem: Rengvedanên Biryarên DMMEyê û Pêvajoya Venêrînê ya Berdewam a Komîteya Wezîran li ser Hiqûqa Navxweyî ya Tirkîyeyê	
Rengvedanên Biryarên DMMEyê û Pêvajoya Venêrînê ya Berdewam a Komîteya Wezîran li ser Hiqûqa Navxweyî ya Tirkîyeyê	55
Beşa Heftem: Pirsgirêkên di Sepandinê de: Desteyên Rêveberî û Çavdêriyê	
1. Destpêk	58
2. Avasaziya Desteyê û Rêveçûna Wê	59
3. Nirxandina Reftarên Baş	59
4. Pirsgirêkên Hiqûqî	60
5. Encamên di Sepandinê de	60
6. Pêşniyar	60
Beşa Heştem: Encam	
Encam	63
Çavkanî	67

KURTEBÊJE

DMME: Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê

PMME: Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê

DDB (AYM): Dadgeha Destûra Bingehîn

NY: Neteweyên Yekbûyî

CAT: Komîteya Neteweyên Yekbûyî ya li Dijî Îşkenceyê (Committee Against Torture)

CİSST: Komeleya Civaka Sîvîl di Pergala Înfaza Sizayî de (bi tirkî Ceza İnfaz Sisteminde Sivil Toplum Derneği)

CMK: Qanûna Rêbaza Darizandina Sizayî (bi tirkî Ceza Muhakemesi Kanunu)

CPT: Komîteya Ewropayê ji bo Pêşîlêgirtina Îşkenceyê (European Committee for the Prevention of Torture)

ÇHD: Komeleya Hiqûqnasên Hemdem (bi tirkî Çağdaş Hukukçular Derneği)

HRC: Komîteya Neteweyên Yekbûyî ya Mafên Mirovan (Human Rights Committee)

İHD: Komeleya Mafên Mirovan (bi tirkî İnsan Hakları Derneği)

MSHS: Peymana Mafên Medenî û Siyasî

OHAL: Rewşa Awarte

ÖHD (KHA): Komeleya Hiqûqnasên ji bo Azadiyê

SPACE: Statîstîkên Sizayî yê Salane yê Konseya Ewropayê (Statistiques Pénale Annuelles du Conseil de l'Europe)

TBMM: Meclîsa Neteweyî ya Mezin a Tirkîyeyê

TCK: Qanûna Sizayî ya Tirkîyeyê

TİHV: Weqfa Mafên Mirovan a Tirkîyeyê

TMK: Qanûna Dijeterorê (Qanûna hejmar 3713) TOHAV: Weqfa Lêkolînên Civak û Hiqûqê

TUİK: Saziya Statîstîkan a Tirkîyeyê

DSN: Dadgeha Navneteweyî ya Sizayê

“Girtin bi xwe sizakirin e. Rejîma ku li girtiyan tê sepandin divê zexta di xwezaya
girtinê de heyî girantir neke.”

-Rêzikên Girtîgehan ên Ewropayê

KURTE

Piştî ku li Tirkiyeyê sizayê îdamê hatibû rakirin, li şûnê, sizayê hetahetayî yê girankirî hatibû danîn; ev rapora ji aliyê Weqfa Lêkolînên Civak û Hiqûqê (TOHAV) ve hati amadekirin armanc dike ku wan pirsgirêkên binyadî destnîşan bike ku di warê rûmeta mirovan û mafê hêviyê de ji ber rejîma înfazê ya sizayê hetahetayî yê girankirî rû didin. Ev xebat nîşan dide ku ev rejîma înfazê veguheriye şewazeke sizakirinê ya ku dibe sedema “bêhêvîbûneke hetahetayî” û bi vê armancê, ev xebat bi taybetî bala xwe dide ser girtiyên ku bi sizayê hetahetayî yê girankirî hatine sizakirin. Di vê raporê de hêvî ne tenê weke ihtimala berdanê ya kesan tê dîtin, lê her wisa weke mafekî bingehîn ê mirovan tê hesibandin ku bendewariyên kesan ên ji bo siberojê û kapasîteya wan a ji bo guherîn û jinûvetevlêbûna nava civakê biparêze.

Rejîma înfazê ku esasê wê li ser sizayê girtina hetahetayî yê girankirî ye, ne tenê bandorê li girtiyan dike, her wisa li prensîba dewleta hiqûqî û li siberoja civaka demokratîk jî dike û ev xebat di heman demê de binê vê yekê jî xêz dike. Tunekirina mafê hêviyê ji sînorên mirovane û rewşa yên sizadanê jî dibuhure; wekî tişteki normal dide nîşandan ku têgihîştineke edaletê ya wisa hebe ku tê de mirov mehkûmî bêsiberojbûnê bibin. Di vê çarçoveyê de armanca vê raporê ew e ku piştgiriya bide xurtkirina îradeya reformxwaziyê, ya ku di sistema sizadan û edaletê de piştî xwe dispêre parastina rûmeta mirovan, û dîsan armanceke wê ya din jî ew e ku bangeke civakî û hiqûqî bike ji bo ji nû ve bicihkirina mafê hêviyê li Tirkiyeyê.

Armanca sereke ya raporê ew e ku mafê hêviyê

ji qada nîqaşên hiqûqî yên razber derxîne û wê bike navenda polîtîkayên sizadan û înfazê yên li Tirkîyeyê.

Nirxandina li ser esasê pêşîneyên dadgehî (îctîhad) yên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê û standardên Neteweyên Yekbûyî nîşan didin ku rejîma înfazkirina sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî û qedexeya miameleya nemirovane û biçûkker li hev nakin; ev jî tesbît dike ku ev pîrsgirêk ne bînpêkirîneke takekesî ye, berevajî, ew bînpêkirîneke binyadî ye. Ji vê hêlê ve ev xebat ji bo xebatên şopandin û parêzvaniyê yên li welêt û navneteweyî zemîneke xurt a hiqûqî û normatîf pêşkêş dike.

Ev rapor xwe tenê bi nirxandîneke hiqûqî ya normatîf sînordar nake; xwe dispêre pêvajoyeke kolektîf a belgekirinê ya bi daneyên çawanîyî hatî xurtkirin ku ji hevdîtînên bi parêzer, xizmên girtiyan, baro û rêxistinên pişeyî re hatine çêkirin. Bi vê nêzîkatîyê dixwaze berçav bike û bide zanîn ku rejîma înfazê ya sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî ne sepandîneke takekesî ye, lê pîrsgirêkeke têkildarî mafên mirovan e ku berbelav, domdar û sistematîk e.

TOHAV bi rêya vê raporê dixwaze berpirsariyên Tirkîyeyê yên ji ber pejirandina peymanên navneteweyî bi bîr bixe; armanca ew e ku bînpêkirinên ji ber rejîma înfazê ya sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî ji bo mekanîzmayên Konseya Ewropayê, mekanîz-

mayên Neteweyên Yekbûyî û raya giştî berçav bike. Bi taybetî jî, di çarçoveya biryarên ji aliyê Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê ve venihartî de, ev rapor dê weke alavêkî şopandin û raporkirinê bê bikaranîn da ku balê bikişîne ser lezgînbûna reformên qanûnî û saziyî yên ji bo misogerkirina mafê hêviyê.

Weke xaleke dawîn, armanca vê xebatê ew e ku li bara mekanîzmayên venihartinê ya navneteweyî berpirsariyê û berbariyên Tirkîyeyê bi awayekî şênber, belgekirî û berawirdkirî nîşan bide; belgeyeke bingeîn a referansê / çavkaniyî ava bike ji bo xebatên parêzvaniyê yên bi saziyên pîr giring re, yên wekî Parlamento, Wezareta Dadê û Gerîndetîya Giştî ya Saziyên Sizakirinê û Girtîgehan. Têbîniyên politîkasaziye yên der heqê tesbîtên raporê de dê bo mekanîzmayên navneteweyî yên peywendîdar bîr şandin, Komîteya Neteweyên Yekbûyî ya li Dijî Îşkence û Miami-leyên Taybet ji tê de.

“Her mirov ji dayikbûnê ve xwediye mafê jiyanê ye. Ev maf bi qanûnan hatiye parastin. Nabe ku tu kes bi awayekî kêfî ji mafê xwe yê jiyanê bêpar bê hîştin.”

- Peymana Mafên Medenî û Siyasî

Beşa Yekem

EV RAPOR ÇI DIHEWÎNE, ARMANC Û RÊBAZÊN WÊ ÇI NE?

1. Destpêk

Rejîma înfazê ya sizayê girtina hetahetayî yê girankirî piştî rakirina sizayê darvekirinê li şûna wî sizayî hatibû bicîkirin û tê texmînkirin ku sizayê 4000 girtiyan di vê çarçoveyê de ye û ev rejîma sizayê dike ku girtî bi verastkirinên (birêkûpêkkirinên) înfazê yên cudaker û li ser bingeha tecrîdkirinê “heta dawiya emrê xwe” li girtîgehan bîn ragirtin; ev rapor jî dixwaze destnîşan bike ku ev rejîma înfazê li rûmeta mirovan nayê û mafê hêviyê bînpê dike. Ev rapor di serî de beyan dike ku mafê hêviyê mafekî bingeîn e ku bendewariyên kesên ên ji bo sîberojê û derfeta wan a guherîn û vege- ra li nava civakê diparêze û li ser vê esasê, ev rapor angaşt dike ku ku di pergala sizakirin û dadmendiyê de sepanî û pratîkên ku hêviyê ji binî ve ji holê radikin ji hêla hiqûq û etîkê

ve ne rewşa ne. Pêşîneyên dadgehî yên Dad- geha Mafên Mirovan (DMME) û hişyariyên ji organên venêrinê yên Neteweyên Yekbûyî (NY) li ser Tirkîyeyê jî vê nîrxandinê piştrast dikin. Di vê çarçoveyê de ev rapor bi awayekî spesîfîk di behsa wan girtiyan de mafê hêviyê dinirxîne, yên ku ji ber ku di peywenda “si- zayên terorî û destûrî” de bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatine sizakirin, tu îmkaneke wan a berdana bimerc nîn e. Li gorî krîterên DMMEyê jî “mafê hêviyê” têkildarî vê kategoriyê tê nîqaşkirin. Li gel vê jî, behs ji rewşa wan girtiyan jî tê kirin, yên ku di statûya hikumxwariyên sizayê hetahetayî yê girankirî de ne, lê ji ber zêdebûna salên siza- yan û kêfîbûn û pêkanebûna pêşbînîkirinê ya mekanîzmayên biryardanê yên ji bo berda- na bimerc, tevî ku li gorî mewzûatê (zagonan) îmkana wan a berdana bimerc heye, di pratîkê

de ev îmkân bi mekanîzmayên cure bi cure hatiye astengkirin û rewşa hikumxwariyên ku ji ber mekanîzmayên “hêvîşikînê” di pratîkê de îmkana wan a berdanê nîn e.

Ev rapor tenê der heqê rejîma înfazê de ye û ka darizandina ku bûye bingeha sizadayîn û girtinê li gorî prensîbên dadmendbûna hatiye kirin an na, ev rapor vê yekê di nava xwe de nahewîne.

Weqfa Lêkolînên Hiqûqî û Civakî bi amadekirina vê raporê xwestiye ku balê bikişîne ser wê yekê ku li Tirkiyeyê di hiqûqa sizayî û înfazê de bicihanîna reformeke (çaksaziyeke) li ser bingeha rûmeta mirovan hem hewce ye hem jî divê bi lezgîni pêk bê û her wiha bi vê xebatê yek ji mebestên wê jî ew e ku bangewaziyeke xurt bike da ku gavên pêwîst bînin avêtin seba ku mafê hêviyê bi hemû rehendên xwe yê têgihî û sepandinî ve bê parastin.

Di bingeha çavdêrî û analizên raporê de xebatên rêxistinên civaka sîvil ên di vî warî de, lêkolînên akademîk, raporên li ser vê mijarê, mewzûata neteweyî û lêkolînên li ser hiqûqa navneteweyî û pê re jî biryarên DMMÊyê û çavdêriyên nihayî yê organên Neteweyên Yekbûyî hene. Ji ber vê yekê, çarçoveya merciyên hiqûqî û mekanîzmayên darazê yê navneteweyî yê hiqûqa pozîtîf xêz kirî çarçoveya seta têgihan a vê raporê pêk tîne.

2. Serzêdeyîyên Raporê û Pêşniyar

Armanca vê raporê ew e ku mafê hêviyê ji qada nîqaşên teorîk derxîne û alîkariya wan hewldanan bike ku dixwazin mafê hêviyê bibe mijareke kartêker a rojevê di pratîkên hiqûqî û siyasî de. Mafê hêviyê têgiheke pirtebeqeyî ye ku tenê ihtîmala serbestmayîn û azadiya kesan nahewîne, her wiha mafê kesan ê watedayîna jiyane jî di nava xwe de dihevine bi rêya bendewarî, fersend û plansaziyan. Ev rapor dixwaze vê têgihê bi hemû alî û rehendên wê ve bide zanîn û serzêdeyîyê li nîqaşên akademîk û civakî yê di vî warî de bike.

2.1. Serzêdeyîya Têgihî

Serzêdeyîya pêşîn a raporê zelalkirina çarçoveya têgihî ya mafê hêviyê ye. Mafê hêviyê ne tenê pêdivîyeke derûnî ya takekesî ye, her wiha, mafekî bingehin e ku divê hiqûqên bê naskirin û parastina wê têkiliyê ye ku mirov bi siberojê re datînin. Ji ber hindê, ev rapor xwe dispêre biryarên navneteweyî yê heta roja îro, paşxaneyê dirokî û felsefeya etîk û mafê hêviyê weke kategoriyeke mafan a serbixwe pênase dike.

Ev zelaliya têgihî bi qasî ku karê hiqûqê yê bisazakirina rabirdûyê nîşan dide, ew qasî jî îşaretê bi berpirsariya wê ya parastina siberojê jî dike. Perspektîfa mafê hêviyê dayî dê berê pergalên hiqûqê biguherîne; ji ber ku ew mafekî welê ye ku dibêje dewlet nikarin kesan tenê li ser tawanên wan ên bihurî binirxîne, her wiha

lazim e ku ew kapasîteya wan a guherîn û veguherînê ya di siberojê de ji bide ber çavan.

2.2. Serzêdeyiyên Dîrokî û Hiqûqî

Armanca vê raporê ew e ku tecrîbeyên dîrokî bi bîr bixe û bi vî awayî nîşan bide ka mafê hêviyê çima meseleyeke mafên mirovan e; li seranserê dîrokê sizayên kuştinê û rejîmên bêhêvîhîştinê çawa mirov tune kirine û civak kirine bin zext û pêkutiyên.

Pêşîneyên dadgehî yên DMMEyê yên li ser sizayên girtîgehê yên hetahetayî û nîrxandinên mekanîzmeyên NYyê bingeha hiqûqî ya mafê hêviyê xurttir kiriye. Armanca vê raporê ew e ku li ser van esasan, xala 3yem a Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê (ya li ser qedexekirina mîameleya nemirovane) ji tê de, peywendî hiqûqa navneteweyî ya mafê hêviyê zelal bike. Bi vî awayî, armanca vê raporê ne tenê ew e ku ji bo pergala hiqûqa neteweyî, lê di heman demê de ji hêla normên mafên mirovan ên navneteweyî de ji rêyekê nîşan bide û peywireke bi vî rengî bi cih bîne.

2.3. Serzêdeyîya Demokratîk û Civakî

Civaka demokratîk ji wê yekê berpirsyar e ku esta pêbawerîya kesana ji bo siberojê biparêze. Mebesta vê raporê ew e ku di vê çarçoveyê de cextê li ser mafê hêviyê bike û diyar bike ku demokrasî ne tenê ji hîlbijartinên serbest û mafê xwe îfadekirinê pêk tê, her wiha ew bi parastina bendewarî û hêviyên ji bo siberojê

yên hemwelatîyan jî pêkan dibe.

Civakeke ku ji kesên hêvîbir bûyî pêk hatî ji siyasatê xerîb dibe, bawerîya wê bi hiqûqê namîne û meylêr dibe ji bo otorîterbûnê. Ji ber vê çendê, mafê hêviyê yek ji pîvanên sereke yên demokrasîyê ye. Ev rapor vê xalê derdixe pêş û bi bîr dixe ku ew berpirsariya pergalên hiqûqê ye ku bawerîya kesana bi siberojê biparêzin.

2.4. Serzêdeyîya di Çarçoveya Tirkiyeyê de

Her wekî ku ew ê di beşa têkildar de jî bi hûrgîyên xwe bê nîqaşkirin, ev rapor bi taybetî di çarçoveya Tirkiyeyê de dixwaze nîşan bide ku esasan sizayê girtîgehê yê hetahetayî bi rengekî sizayê mirinê ye û kesên ku di vê rejîmê de bi awayekî biyolojîk hebûna xwe berdewam dikin, hiqûqên mehkûmî mirinê dibin. Her wisa, rapor bi bîrê dixe ku ev sepanî bi standardên mafên mirovan ên navneteweyî re li hev nake û DMMEyê gelek caran biryara bînpêkirinê daye.

Bi vî aliyê xwe, ev rapor ne tenê banga nîqaşê akademîk dike, her wiha ew bangewaziyek e ji bo pêkanîna reformeke hiqûqî û civakî. Cext lê tê kirin ku ji bo ku li Tirkiyeyê mafê hêviyê bikare bê parastinê divê di hiqûqa sizadan û înfazê de guhartinên mezin û radîkal bên kirin, rejîma sizayê girtîgehê yê hetahetayî divê bê revîzekirin û şefafî û hesabdayîn bên sepanî.

2.5. Pêşniyarên Polîtîka û Reforman

Ev rapor ji bo parastina mafê hêviyê van pêşniyarên sereke dike:

- **Mekanîzmayên Berdana Bimerc:** Di sizayên girtîgehê yên hetahetayî yên girankirî de piştî demeke diyarkirî derfeta derbaskirina di ber çavan re û berdana bimerc divê bê dayîn.
- **Mirovanebûna Rejîma Înfazê:** Sepandinên tecrîdê divê ji holê bên rakirin û bernameyên pêwîst bên pêxistin da ku girti bikarin têkiliyên xwe yên civakî û psikolojîk berdewam bikin.
- **Şefafbûn:** Dane û agahiyên li ser hikumxwariyên bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatî sizakirin lazim in ku bi awayekî rêkûpêk bi raya giştî re bên parevekiri û hevahengiya bi raporên navneteweyî divê bê bicihanîn.

2.6. Encam

Weke encam di vê raporê de mafê hêviyê ne tenê weke mafekî takekesî, lê di heman demê de weke hêmaneke bingeîn a pergala civakî û meşrûiyeta demokratîk tê nîqaşkirin. Ji ber ku çendî mirov bikare xeyalan bike, hinde mirov mirov e; çendî mirov bikare girêdayî civakê bibe, hinde mirov welatîyek e. Tu siza yan tu pergala û desthilat nikare vê taybetmendîya sereke ya mirovan bi tevahî ji holê rake.

Ji ber vê çendê, îro roj, mafê hêviyê yek ji ezmûnên herî krîtîk ên pergalên hiqûqê ye. Armanca vê raporê ew e ku vî mafî berçavtir bike, di asta hiqûqî û civakî de nîqaşên di warî de xurttir bike û serzêdeyîyekê li îradeya reformê bike.

Mafê hêviyê bingeha mirovahiyê ye; pergaleke ku hêviyê qedexe dike mirovbûnê jî qedexe dike.

Li gorî vê cexta sereke, rapor serê pêşîn zemîna têgihi û dîroki ya mafê hêviyê nîşan dide; piştî re lê dikole ka ev maf di hiqûqa navneteweyî de çawa hatiye pênasekirin û vê yekê jî di ro-nahiya pêşîneyên dadgehî yên DMMEyê û belgeyên NYyê de dike. Di pey vê re, nîşan û tesbîtan raberî me dike ka li Tirkîyeyê rejîma înfazê ya sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî çawa mafê hêviyê binpê dike; li ser rola hêvîşîkîner û astengker a destyên îdarî û çav-dêriyê yên li pêşîya berdana girtiyan bi sizayê hetahetayî yê girankirî sizakirî. Di beşa dawîn de jî me cih daye pêşniyarên ji bo polîtîka û reformên hiqûqê bi mebesta parastina mafê hêviyê.

“Sizaya ragirtina di hucreya yekkesî de tenê di rewşên îstîsnayî de bo demeke
kurt û bi destûra merçiyên rayedar dikare bê sepandin û divê ji venêrîna
serbixwe re vekirî be.”

-Rêzikên Mandela

Beşa Duyem

BINGEHÊN TÊGIHÎ, DÎROKÎ Û NORMATÎF ÊN MAFÊ HÊVIYÊ

1. Mafê Hêviyê Çi Ye?

1.1. Çarçoveya Têgihî ya Mafê Hêviyê

Sêwirandinên mirovan ên ji bo siberojê, kapasîteya wan a danîna plansaziyan û hêz û daxwaza wan a berdeyamkirina jiyana xwe divê ne tenê weke pêdivîyeke psikolojîk; lê di heman demê de weke kategoriyeke sereke ya mafan jî bê nîrxandin. Têgiha “mafê hêviyê” di vê çarçoveyê de derketiye holê. Mafê hêviyê tê wê maneyê ku mercên heyî çi qasî giran dibin bila bibin, ihtimala serbestberdan, pakbûn an jî ji nû ve tevlêbûna nava civakê li tu kesî nikare bê qedexekirin. Heke ji jiyînê mebest ne tenê berdeyamkirina hebûna mirovan a biyolojîk be, lê ew be ku mirov bi awayekî hêjayî rûmeta mirovahiyê bijîn, nexwe hewce ye ku ev maf bê bicihanîn.

Biryarên DMMEyê bi taybetî di dozên têkildarî sizayên girtîgehê yê hetahetayî de ev maf piştrast kiriye. Dadgehê cext li wê yekê kiriye ku wexta ku ne pêkan be ku ew sîza ji nû ve bîn nîrxandin an jî ihtimala berdana bimerc ji bîn ve neyê naskirin, hingê sizayên girtîgehê yê hetahetayî yan jî rejîmên înfazê yê vi teherî pêwîstiyên qedexeya nemirovane û biçûkker bi cih nayînin. Ji ber ku eger hêviya siberojê li ser kesan bê birîn, ev tişt kapasîteya guherîn û veguherînê ya di eslê mirovan de heyî tune dihesibîne. Bingeha mafê hêviyê ew qebûlîkirin e, ya ku dibêje kesên tawanên herî giran jî kirî jî dikarin biguherin, poşman bibin û dîsa li civakê bîn vegerandin.

Bingeha têgihî ya mafê hêviyê li ser van pirsan ava dibe: Dema ku dewlet sizayê dide kesan, gelo dikare wan kesan ji hemû ihtimalên siberojê bêpar bihêle?

Mirov azadiya mirovan a fîzîkî sînordar bike, ev tenê bes e ji bo ku mirov wan kesan

ji jiyane qut bike yan kuştina hêviya mirovan ji midaxeleyeke bi heman awayî giran e? Ev pirs nîşanî me didin ka mafê hêviyê divê çima weke meseleyeke mafên mirovan bê nîrxandin.

Têgiha mafê hêviyê ne tenê di behsa girtiyan de tê nîqaşkirin. Esasen di bingeha wê de ev prensîb heye; mirov divê bikarin di hemû warên jiyane de şiyar û kapasîteya xwe ya bendewarî û plansaziyên ji bo sîberojê biparêzin. Di hiqûqa sizayî de mafê hêviyê herî zêde der heqê rewşa kesên bi sizayê girtîgehê yê he-tahetayî sizakirî de tê rojevê. Eger tu îmkana jinûvenîrxandina sizayî yan berdana bîmerc bo van kesan neyê dayîn, hingê ev sazîyê dayî wan ji aliyê biyolojîk ve sax dihêle, lê ji aliyê hiqûqî ve dîkuje. Ji ber vê yekê, mafê hêviyê ne tenê prensîbeke xweser a hiqûqa sizayî ye, di heman demê de kategoriyeke berfirehtir a mafan a têkildarî parastina rûmeta mirovahiyê jî di hewîne.

Ji hêla têgihî ve mafê hêviyê sê hêmanên herî bingeîn ên mirovan, yê der barê sîberojê de misoger dike. Mirov dikare van hêmanan weke “bendewarî, fersend û plansazî” bise-nîfîne. Bendewarî dihêlin ku mirov îmkane xwehilîandina ji mercên jiyani yê heî di serê xwe de bisêwirîne; fersend îhtimala pêk-hatina vê xeyalê û sêwirandinê misoger dîkin; plansazî jî diyarkirina wê bergehê ye ku pêwîst

e û bi saya wê mirov dikare wateyekê li jiyane bar bike. Eger girtiyeke yan hukimxwariyekî bi sizayekî giran sizakirî bi tu awayî nekare xwe bigihîne van sê hêmanan, ev tê wateya binpê-kirina mafê hêviyê.

Mafê hêviyê di heman demê de mafê kesan ê parastina nasnameyê ye jî. Mirov ne tenê ji kirinên xwe yê rabirdûyê pêk tînin; ew bi xeyalên xwe yê ji bo sîberojê û bi kapasîteya xwe ya guherînê hebûna xwe pêk tînin. Ji ber vê yekê, eger mirov ji kesekî/ê re bibêje “êdî ji bo te tu îhtimalên din nînin”, ev ne tenê azadiya wan kesan, lê mirovtiya wan jî veder dike. Ji ber vê çendê, mafê hêviyê ji bo dew-let û takekesan hem ji aliyê hiqûqî ve hem jî ji aliyê etîk ve xwedî zemîneke normatîf a jênegere.

1.2. Bingeên Dîrokî û Hiqûqî yê Mafê Hêviyê

Wexta ku mirov mafê hêviyê bi pratîkên sîza-kirinê yê mirovahiyê re dinirxîne, mirov reh û jêderkên mafê hêviyê bi awayekî zelaltir fam dike. Di tevahiya dîrokê de dewlet û desthila-tan sizakirinê ne tenê weke bersiv û encama sûcan, lê weke amûrekî ji bo bipergalkirina civakê, bîdengkirina mixalefetê û pihêtkirina otorîteyê bi kar anîne. Di vê heyamê de jîholêrakirina her îhtimala li ser jiyar û sîbe-roja kesan bûye rengê herî tund ê sizadanê.

1.2.1. Paşxaneyê Dîrokî

Di Serdema Navîn de zindane ku mirov tê

de dihatin zincîrkin, rêbazên îşkenceyê û sizayên darvekirinê ne tenê ji bo wê yekê bûn ku wan kesan ji holê rakin, di heman demê de mebest ew bû ku bi van gef li civakê bê xwarin û ew bîr tirsandin. Laşê kesê darvekirî li meydana dihat nîşandan û bi vî awayî hewl dihat dayîn ku tevahiya civakê “nebûna siberojê” bibîne. Ev stratejiyek e ku ne tenê hêviya takekesan, lê hêviya civakê jî tepeser dike.

Di serdema hevdem (modern) de jî bi taybetî rejîmên totalîter heman rêbaz xebitandine. Kampên komkirinê yên Naziyan, politikayên “windabûn”ê yên Amerîkaya Latîn, van hemûyan heman peywir bi cî aniyê. Van hemûyan hêviyên kesan ên ji bo siberojê dibirîn û wisa jî hebûna wan a mirovî ji holê radikir. Eger mirov wiha binirxîne, tunekirina hêviyê çeka herî xurt a birdozîyî ya sizadanê ye.

A di vir de, li dijî van pratîkên bi domana dîrokê re rû dayî, armanca sereke ya hiqûqa mafên mirovan ew bûye ku jiyan, rûmet û xeyal û sêwirandinên mirovan ên li ser siberojê biparêze. Belgeyên mafên mirovan hin rêzik danîne ku rewabûna sizadanê bi sinor dîkin û wisa jî nehiştine ku “dewlet hêviyê bi tevahî ji destê mirovan bigire”.

1.2.2. Belgeyên Hevdem ên Mafên Mirovan

Geşedanên di sedsala 20em de di warê mafên mirovan de pêk hatî zemînek afirand ku mafê hêviyê bibe tîgîhek. Di Beyannameya Gerdûnî ya Mafên Mirovan a 1948an de tê pên-

sekirin ku mafê hemû mirovan e ku jiyanê li gorî rûmeta mirovan bibin serî û vê beyannameyê di sepandinên sizayan de mîameleya nemirovane û biçûkker qedexa kiriye. Piştî vê, di sala 1950yî de Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê (PMME) ket meriyetê ku xala 3yem a vê peymanê, xala 7em a Peymana Mafên Medenî û Siyasî ya Neteweyên Yekbûyî (PMMS) û Peymana Neteweyên Yekbûyî ya li Dijî Îşkenceyê ya 1987an bi taybetî li ser vê mijarê radiwestiyane û îşkence û mîameleya xirab qedexa kirine. Ev qedexeya teqez di nava demê de bûye yek ji bingeşên herî giring ên mafê hêviyê di hiqûqa navneteweyî de.

Bi taybetî ji keriyê duyem ê sedsala 20em pê ve meyla gerdûnî ya li ser rakirina sizayê mirinê hiştiye ku mafê hêviyê zêdetir berçav bibe. Gelek welatan sizayê mirinê rakirine, li şûna wê sizayê girtîgehê yê hetanî dawîya emrê mirovî yan jî sizayê girtîgehê yê hetahetayî (sermedî) yên girankirî anîne. Lê belê di van sizayan de jî eger derfeta berdana bimerc nebe, ev bi awayekî fiilî tîr maneya “kuştînekê sîvil”. Bi gotîneke din, destûr heye ku ew kes bijî, lê tu ihtimal nayê hiştin ku ew kes ji bo siberojê ji xwe re jiyanekê ava bike.

1.2.3. Serzêdeyîya Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê di Vî Warî de

Pêşîneyên dadgehî (îctîhad) yên DMMEyê, ku li jêrê di beşa tîkildar de bi berfirehî hatine nîqaşkirin û der heqê sizayên girtîgehê yên hetahetayî ne, yek ji xalên werçerxê yên herî giring in di pejirandina mafê hêviyê weke ma-

fekî şênber. Dadgehê bi zelalî diyar kiriye ku sizayên girtîgehê yên hetahetayî û bêyî derfeta berdana bimerc li kesan sepanî ne li gorî qedexeya miameleya nemirovane ne.

Bi taybetî biryarên ji 2010an pê ve hiştine ku ev maf li ser zemîne hiqûqî bê rûniştandin. “Mirov xwedî wê şîyan û kapasîteya guherîn û veguherînê ye”, dadgehê ev prensîb ji xwe re kiriye bingeh û diyar kiriye ku eger kesek bêyî tu ihtimaleke berdanê li girtîgehê bê ragirtin, ev ne li gorî rûmeta mirovahiyê ye.

Mafê hêviyê ne tenê têgiheke teorîk e, her wiha di hiqûqa mafên mirovan a Ewropayê de bûye qadeke şênber a pêşîneyên dadgehî.

Prensîbên ku bûne bingeha pêşîneyên dadgehî yên DMMeyê, piştî helwesta Komîteya NYyê ya Mafên Mirovan û Komîteya li Dijî Îşkenceyê ya li ser heman mijarê, ev mesele ji herêmbûnê jî buhuriye û ji xwe re di qada gerdûnî de cihek bi dest xistiye. Bo nimûne, Komîteya NYyê ya Mafên Mirovan di sala 2023yan de ji DYeyê xwestiye ku morator-yûmekê (rawestandin / qedexekirina demkî) ragihîne di sizayên girtîgehê yên heta dawîya emrî de, yên ku bêyî berdana bimerc li kesan tên sepanandin. Komîteya li Dijî Îşkenceyê jî di rapora xwe ya nîrxandinê ya tebaxa 2024an de, ku têkildarî rewşa Tirkîyeyê ye, xwestiye ku ev rejîma înfazê bê rakirin ji ber ku ew ne li gorî prensîbên Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê ye.

1.2.4. Bingehîn Normatîf

Ji belgeyên hiqûqî û îctihadan wêdetir, mafê hêviyê her wiha xwe dispêre bingehê felsefî û etîk jî. Weke heyînekê wexta ku mirov ji van xeyal û sêwirandinan tê xalîkirin û bêpar-hîştin, ji xwebûna nasnameya xwe tê qut dibe. Ev rastî yek ji nîrxên hevpar ên mirovahiyê ye: hemû mirov xwedî kapasîteya guherînê ne, yên ku sûcên herî giran kirî jî tê de. Ji ber vê yekê, tunekirina hêviyê û qebûlnekirina mirovahiya kesan xwedî heman giraniyê ne.

Ev bingeha normatîf divê bibe prensîbek ku ne tenê bergeha hiqûqa sizayî diyar dike, her wisa ya tevahiya pergala hiqûqê jî diyar dike. Ji ber ku ne tenê tevahiya rêzikan e ku reftarên kesan bi rêk û pêk û bi qaîde dikin, her wiha ew têkiliya mirovan a bi siberrojê re jî diparêze.

1.3. Giringiya Mafê Hêviyê ji bo Civakeke Demokratîk

Mafê hêviyê tenê meseleyeke teng a xweserî hiqûqa sizayî nîn e. Di esasê xwe de nîrxekî jênegere jî bo berdewamiya civakeke demokratîk. Ji ber ku demokrasiya mirovan ne tenê bi azadiyên îroyîn li ser pêyan digire, her wisa bi hesta pêbaweriyê ya ji bo siberrojê jî vê yekê dike. Pergaleke ku mirov tê de nikare ji bo siberrojê xwedî hêvî be, ew pergal derî li otorîterbûn û zextan vedike. Ji ber vê çendê, mafê hêviyê di nav parametreyên herî hestiyar ên demokrasîyê de ye.

1.3.1. Hêvî û Girêdana Hemwelatîbûnê

Civakeke demokratîk ne tenê bi derfeta dengdanê yan azadiya derbirîna fikir û ramanan hebûna didomîne, lê di heman demê de bi hesta kesan jî vê yekê dike ku ew kes xwe li ser siberojê xwedan-gotin dihesibînin. Heke mirov di siberojê de hêviya tu baştirbûn, azadbûn an edaletê neke, baweriya wan bi pergala siyasî namîne. Ev rewş hêmana beşdarbûnê ya demokrasîyê qels dike.

Mafê hêviyê dike ku hebûna mirovan hem weke kirdeyên hiqûqî hem jî weke kirdeyên civakî bê misogerkirin. Çimkî mirov tenê bi qasî ku dikare xewn û xeyalên xwe ji bo pêşerojê ava bike, bi civakê ve girêdayî dimîne. Hemwelatîyên ku hêviya wan ji destê wan hatiye standin, ji siyasê û jiyana hevpar diqetîn; ev jî tevna civaka demokratîk hilweşîne.

1.3.2. Politikayeke Sizayî ya Etîk û Standarta Hêviyê

Di civakeke demokratîk de, politikaya sizayî divê ne tenê li ser sizakirina kesan, lê di heman demê de li ser veğerandina wan kesan a bo civakê jî were avakirin. Di vê çarçoveyê de mafê hêviyê pîvanek e da ku mirov hîn bibe ka sizayek bipîvan û mirovane ye yan na. Heke rejîmeke sizayê hemû ihtimalên siberojê yên mirovan ji holê radike, meşrûiyeta demokratîk a wî sizayî tê nîqaşkirin.

Nêrîneke ku di literatura hiqûqê de her ku diçe xurt dibe, angaşt dike ku di diyarkirina

standartên etîk ên sizayan de divê “krîtera hêviyê” were esasgirtin. Li gorî vê nêrînê, ji bo ku sizayek meşrû were hesibandin, divê ji bo kesan, teorîk jî be, divê ihtimalek bê parastin da ku ew kes xwedî hêvî û bendewariyan bin li ser siberojê. Pergaleke sizayê ya ku mirovan ji hêviyan xalî dike, ne tenê ji aliyê mirovî ve, lê ji aliyê demokratîk ve jî nayê pejirandin..

1.3.3. Hêvî û Pêbaweriya Civakî

Rêveçûna civaka demokratîk li ser wê yekê ye ku mirov bi hiqûqê, sazî û dezgehan û bi hevdu bawer bin. Eger mirov bawer bikin ku pergala dî tu rêya xelasiyê nede pêşiya wan, hingê ev bawerî jî binî ve tê şikandin. Mekanîzmaya mafê hêviyê bi taybetî nahêle ku girtî hêviya xwe ji civakê bibirin.

Ku girtiyekî/ê di pêşerojê de ihtimala xwe ya azadbûnê hebe û mercên pêwîst û pêvajoya ku dê bimeşe bizane, ev ne tenê baweriya wan kesan, lê baweriya civakê ya bi pergala adeletê jî xurt dike. Çimkî ev ihtimal nîşan dide ku dewlet mirovan ne tenê sîza dike, lê her wisa dema şert bi cih bûn, şanseki din jî dide wan. Bi vî awayî, civak pergala hiqûqê wekî amûra tolhildanê na, lê wekî amûra edaletê dibîne.

1.3.4. Hêvî, Guherîn û Rûmeta Mirovan

Baweriya civakeke demokratîk bi guherîna mirovan heye. Rûmeta mirovan ne heûneke welê ye ku li xalekê cemidîbe; berevajî, ihtimala guherîn û pêşketineke domdar di nava xwe de dihevine. Mirovên tawanên herî giran

kirî jî dibe ku piştî demekê xwedî mercên cudatir bin, bikarin fêr bibin û jiyanekê cuda ava bikin; ev ihtimal nîrxekî bîngêhîn ê civakeke demokratîk e.

Bi gotîneke din, şewazên sizadanê yên ku hêviyê tune dikin, tên wateya neqebûlkirina rûmeta mirovan û kapasîteya guherînê ya kesên. Ev rewş bi xwe ne li gorî demokrasiyê ye. Ji ber ku demokrasî mirovan ne tenê bi halê wan ê îroyîn, lê her wiha bi halê wan ê siberojê ve nas dike û diparêze.

1.3.5. Xeta di Navbera Mafê Hêviyê û Otorîterbûnê de

Mafê hêviyê xetake sînorkêz e di navbera rejîmên otokratîk û yên demokratîk de. Rejîmên otorîter kesên mixalîf û komên di nezerê wan de hez nekirî xerikî bêhêvîtiyê dikin û wisa jî desthilatdariya xwe pihêttir dike. Sizayên bêdawî, girtin û mehkûmkirinên kêfî û pratîkên ku tu rêyêke jêfilitînê nahêlin ne tenê takekesan, lê tevahiya civakê duçarî bêhêvîtiyê dikin.

Lê rejîmên demokratîk edaleta sizayî bi însaniyetê hevseng dikin û armanca wan ew e ku ihtimalên siberojê yên kesên biparêzin. Di vê çarçoveyê de mafê hêviyê divê ne wekî îmtiyazeke ku ji girtiyên re tê dayîn, lê wekî yek ji pîvanên demokrasiyê were nîrxandin.

1.4. Mafê Hêviyê di Peywenda Tirkîyeyê de

Nîqaşkirina mafê hêviyê li Tirkîyeyê esasen rasterast têkildar e bi rakirina sizayê mirinê re û bi bicîkirina sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî re ku li şûna wê ket meriyetê. Ev çarçove hem ji aliyê guhartin û birêkûpêkkirin hiqûqî ve hem jî ji aliyê têkiliyên bi hiqûqa navneteweyî ya mafên mirovan ve krîtîk e.

1.4.1. Rakirina Sizayê Mirinê û Derketina Sizayê Girtîgehê yê Hetahetayî yê Girankirî

Wekî ku li jêr di beşa têkildar de bi hûngulî dê bê nîqaşkirin, li Tirkîyeyê piştî guhartinê de destûrê de yên sala 2004an sizayê mirinê bi tevahî hate rakirin û “sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî” li Qanûna Sizayî ya Tirkîyeyê (TCK) hat zêdekirin. Ev birêkûpêkkirin û guhartin di nêrîna yekem de wekî reformeke di berjewendiya mafên mirovan de hate pêşkêşkirin, lê ji aliyê pratîkên ku di nav xwe digire ve bi rastî xwedî taybetiya “mirina sîvîl” li xwe digire. Ji ber ku sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî li şûna sizayê mirinê hatibû anîn û li şûna kuştina kesên armanc ew bû ku kesên “heta dawîya emrê wan bêhêvî” bihêle.

Di behsa sizayê mirinê de siberoja mirovan di carekê de diqede; lê di sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî de ev pêvajoyê di nav nezelayîkê de bi salan didome. Bi wî awayî, giraniya sizayê bi teqezîya mirinê na, bi domdariya bêhêvîtiyê tê hîskirin. Ji ber vê yekê, sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî ren-

gekî din ê sizayê mirinê ye; bi gotineke din, cureyekî “mirina di nava jiyânê de” ye.

1.4.2. Birêkûpêkkirinên Hiqûqî û Derfetên Berdanê

Di Qanûna Sizayî ya Tirkîyeyê de, ihtimala berdana bimerc a sizaxwariyên bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî siza kirî pir kêmtir û sînorkirî ye. Di hin cureyên sûcan de ev ihtimal bi tevahî ji holê hatiye rakirin. Mînak, di sûcên terorê de yan jî di sûcên ku li dijî ewlehiya dewletê hatine kirin de, tu rêya berdanê ji sizaxwariyan re nayê nişandan.

Li gorî vê, tu kes dê xwedî tu vebijêrkan nebe li ser siberoja xwe. Lê belê, prensîbeke bingeîn a hiqûqa navneteweyî ya mafên mirovan dibêje ku her çend sizayê hetahetayî li kesa bê birin jî, piştî demeke diyarkirî divê ihtimala venirxandinê û berdana bimerc hebe. Dema ku mirov li rejîma sizakirinê ya Tirkîyeyê dinihêre, kesên bi tawanên li jor gotî sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî li wan hatî birin, ji bo wan tu ihtimala berdanê nîn e û ji ber vê yekê, ev bi êşkerekî li dijî prensîbên mafên mirovan ên navneteweyî ye.

1.4.3. Biryarên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê û Binbarî û Bêpirsariyên Tirkîyeyê

DMMEyê heta niha di çar serîlêdanên cûda de li ser pratîkên sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî li Tirkîyeyê biryara bînpêkirinê daye. Ji van biryaran û standardên ku hatine

pêşxistin li jêr di beşa têkildar de bi hûrgulî dê bê axaftin. DMMEyê biryar daye ku guhartin û birêkûpêkkirinên bêyî ihtimala berdana bimerc an jî yên tenê di teoriyê de heyt, lê di pratîkê de nehatî sepandin li dijî qedexeya mîameleya nemirovane û biçûkker in.

Di gel ku Tirkîye wekî aliyekî Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê neçar e ku van biryaran bi cih bîne û qanûnên xwe li hev bîne, heta îro reformeke berfireh di vî warê de nehatiye kirin û tenê guhartinên netam û parçeparçeyî hatine kirin. Ev jî dihêle ku Tirkîye di qada navneteweyî de bê rexnekirin.

1.4.4. Giraniya Rejîma Înfazê û Pirs-girêka Tecrîdê

Li Tirkîyeyê sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî ne tenê tê maneya ragirtina bédawî li girtîgehê; ev rejîma înfazê di heman demê de bi giranbûna zêde ya şertên sizakirinê jî tê zanîn. Bi van guhartin û birêkûpêkkirinên di hiqûqa sizayî de girtî ji mafê hêviyê bêpar hatin hiştin; bi taybetî ev girtî bi piranî di şaneyên yekkesî de tînin ragirtin, danûstandinên wan ên civakî tînin sînordarkirin û ji derfetên perwerdeyê yan jî ji wê îmkanê tînin bîparkirin ku careke din entegreyî civakê bibin.

Ev rejîma tecrîdê mafê hêviyê ne tenê di çarçoveya ihtimala berdanê de, lê di warê şertên mirovane yên jiyana rojane de jî bînpê dike. Çimkî hêvî ne tenê bi ihtimala azadbûnê ve girêdayî ye, lê di heman demê de bi şertên jiyaniyê yên mirovane ve jî girêdayî ye. Tecrîda

demdirêj hem ji hebûna psîkolojîk û civakî ya kesan dixwe hem jî dike ku mirovan bîne ser halekî wisa ku nekarin li ser siberojê tu xewn û xeyalan bisêwirînin.

1.4.5. Rexneyên Navneteweyî û Pirsgirêka Şefafbûnê

Komîteyên navneteweyî yên mafên mirovan gelek caran jî Tirkiyeyê daxwaz kirine ku li ser girtiyên ku bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatine sizakirin, dane û minakên sepandina sizayê pêşkêş bike, lê Wezaretê Dadê demeke dirêj agahiyên rojane pêşkêş nekirine. Vê yekê jî hîştîye ku rexneya neşefafbûnê li rejîma sizakirinê û daneyên der barê wê de bê kirin.

Kêmbûna şefafbûnê ne tenê bînpêkirina binbarî û berpirsariyên navneteweyî ye, her wiha faktorek e ku baweriya civakê ya bi pergala adeletê xirab dike. Ji ber ku pergala adeletê ne tenê bi biryarên xwe, lê bi hesabdayîna xwe jî meşrûiyeta xwe bi dest dixwe.

1.4.6 Rehenda Civakî ya Mafê Hêviyê

Di çarçoveya Tirkiyeyê de, bînpêkirina mafê hêviyê ne tenê pirsgirêka girtiyan e. Dema ku civak dibîne ku pergala sîza û edaletê ne li ser entegrasyona jinûve ya bi civakê re, lê li ser mentiqê “mirina di jîyanê de” bi rê ve diçe, baweriya xwe ya bi dewleta hiqûqê jî dest dide. Ev jî hem hêviya kesan hem jî ya tevahîya civakê ya ji bo siberojê dipêritîne.

Ji ber vê yekê mafê hêviyê li Tirkiyeyê hem

pirsgirêkek e ku xwedî peywendekê teknîk a têkildarî pergala sizakirinê jî ye hem jî ji aliyê demokrasiyê, dewleta hiqûqî û ewlehiya civakî ve jî xwedî giringiyeke krîtîk e.

2. Mafê Hêviyê di Hiqûqa Navneteweyî de

1. Reh û Bingehên Dîroki û Normatîf

1.1. Rakirina Pêbîpê ya Sizayê Mirinê û Pîrsên Nû

Hiqûqa sizayî ya modern ji nîveka duyem a sedsala 20em pê ve hêdî hêdî bi awayekî sistematîk terka sizayê mirinê kiriye. Ev pêvajoya di sê xalên sereke de pêk hatiye:

- Ji hêla Neteweyên Yekbûyî (NY) ve:
- Xala 3yem a Beyannameya Gerdunî ya Mafên Mirovan a sala 1948an ragihand ku her kesî “mafê jîyanê” heye û bi vî awayî zemîna yekem a normatîf ava kir ji bo sînordarkirina sizayê mirinê.
- Xala 6an a Peymana Mafên Medenî û Siyasî ya 1966an sizayê mirinê bi tevahî qerdexa nedikir, lê bi awayekî tund bi sînora dikir. Protokola duyem a vebijêrkî ya heman xalê (1989) diyar kiriye ku sizayê mirinê bi tevahî bê rakirin.
- Desteya Giştî ya NYyê ji 2007an pê ve gelek caran di biryarên xwe de bang kiriye ku “moraryûma sizayê mirinê” bê ragihandin.

1. Ji hêla Konseya Ewropayê ve:

- Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê (PMME) ya 1950an sizayê mirinê qedexa nekiriye; lê bi Protokola hejmara 6an (1983) di dema aştîyê de sizayê mirinê rakiriye.
- Bi Protokola hejmar 13an (2002) şer û rewşa awarte ji tê de di hemû şert û mercan de sizayê mirinê hatiye qedexekirin. Îraroj, tevahiya 46 dewletên endam ên Konseya Ewropayê ev protokol erê kiriye.
- Rakirina sizayê mirinê pêşmercek e ji bo endamtiya Konseya Ewropayê. Belarûs tekane dewlet e ku di parzemîna Ewropayê de sizayê mirinê fiilen pêk tîne. Ji ber ku pêkanîna înfazan bi pêvajoyên neşefaf mercên endamtiya Konseya Ewropayê bi êşkerekî binpê dike, Belarûs tu carî bo endamtiya Konseyê nehatiye qebûlkirin.

2. Ji hêla Yekîtiya Ewropayê ve:

- Xala 2yem a Belgeya Mafên Bingehîn a Yekîtiya Ewropayê bi awayekî teqez sizayê mirinê qedexa dike.
- Di çarçoveya Yekîtiya Ewropayê ya berfirehbûnê de ji welatên namzet tê xwestin ku sizayê mirinê rakin. Tirkiyeyê ji li nav pêvajoya hevahengiya bi Yekîtiya Ewropayê re di 2001-2004an de pêvajoyeke reformê ya gavbigav bi rê ve biriye ji bo jîholêrakirina sizayê mirinê. Bi guhartinên di 2001an de sizayê mirinê hema hema ji bo hemû cureyên sûcan ku di

mewzûata sizayî de cih digirin, hatiye rakirin (betalkirin) û heta radeyeke zêde bo sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatiye veguherandin. Tenê di hin sûcên têkildarî destûra bingehîn de sizayê mirinê hatiye mihafezekirin. Di guhartina destûrî ya 2002yan de ev qad zêdetir hatiye bertengkirin. Bi reformên 2004an xala 38em a Destûra Bingehîn hatiye verastkirin û sizayê mirinê bi temamî hatiye rakirin. Xalên di Qanûna Sizayî ya Tirkiyeyê de û yên di qanûnên taybet de hatine derxistin; dîsa di wê salê de Protokolên hejmar 6 û 13an ên Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê hatine erêkirin û li binbariyên Tirkiyeyê yên navneteweyî re hatiye hevahengkirin.

- Di encama vê pêvajoyê de sizayê mirinê hat rakirin û sizayên girtîgehê yên hetahetayî weke sizayê herî giran hatiye bicîkirin. Lê belê ji ber ku sizayê girtîgehê yê hetahetayî nikare bê venihartin û kêmkirin, ji bo girtiyan rewşeke wekî “mirina di jiyanê de” hatiye afirandin. Di vê behsê de di lîteratura hiqûqê de têgiha “mafê hêvî”yê derdikeve pêş.

1.2. Bingehên Normatîf ên Mafê Hêviyê di Belgeyên Navneteweyî de

Mafê hêviyê weke mafekî bi nivîskî di qanûnan de rasterast nehatiye pênasekirin / kodkirin. Lê belê bi qada çeprast a bi şîrovekirina belgeyên navneteweyî bi dest xistî vî mafî xurt dike.

- Xala 3yem a Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê qedexebûna îşkence, mîameleya

nemirovane yan jî biçûkker bi rêk û pêk dike, DMME jî di biryarên yê der barê Vinter û yê Din û Ocalan (No. 2) de mafê hêviyê jî vir dariştiye. Ji ber ku nebûna tu ihtimaleke berdanê ji bo girtiyan bi demdirêji rûmeta mirovahan jî holê radike.

- Rêzikên Mandelayî jî armanca sizayan ne wekî izolekirina kesan jî civakê rave dike, lê dibêje ku armanca wan ew e ku ew kes bo jiyana xwe ya siberojê wisa bîn amadekirin ku rêzê li serweriya hiqûqê bigirin. Meyldariya normatîf a li vê derê bingeha mirovane ya mafê hêviyê xurttir dike.

- Komîteya NYyê ya li Dijî Îşkenceyê (CAT) û Komîteya Mafên Mirovan a NYyê (HRC) di biryarên xwe de rasterast behsa mafê hêviyê nekin jî, cext lê tê kirin ku “rejîmên înfazê ku bêhêvîtiyê diafirînin” ne li gorî qedexeya îşkenceyê ne.

Mafê hêviyê weke xaleke hevbirînê yê prensîbên di van belgeyên normatîf de teşe digire. Bi taybetî, têgiha mekanîzmayeke venihartinê ya di pratîkê de qabilî sepanandinê, berdest û venihartina di demeke maqûl de bûne prensîbên hevpar ên belgeyên navneteweyî.

1.3. Rûmeta Mirovan û Mafê Hêviyê: Teoriya Hiqûqê û Rehenda Felsefî

Bingeha sereke mafê ya mafê hêviyê doktrîna rûmeta mirovan e. Li gorî perspektîfa Kant-parêz mirov tu carî nikarin weke amûrekî bîn dîtin; mirov bi tawanên herî giran rabin jî

divê hêviyeke xwe ya siberojê hebe. Ji dema Locke û Rousseauyî heta roja me sizakirin li ser bînpêkirina peymanê takekesan û civakê hatiye lêkirin. Lê belê bi awayekî bêveger fesixkirina peymanê, heta dawiya emrê wan sirgûnkirina kesan bo derveyê civakê jî dê ne li gorî fikra peymanê civakî be. Ji ber vê yekê, mafê hêviyê ne tenê meseleyeke teknîk a hiqûqa înfazê ye, pêwîstiyekê eslî ya hiqûqê ye bo parastina rûmeta mirovan.

Dadgêha Destûrî ya Federal a Almanyayê, di biryara xwe ya 1977an de, ku tê de li sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî venihartiye, eşkere kiriye ku ragirtina sizaxwariyekê/î bêtî tu nirxandinekê heta dawiya emrê wê/î, ne li gorî rûmeta mirovan e. Dadgehê cext lê kiriye ku rûmeta mirovan nirxek e ku divê ji hêla dewletan ve bi awayekî mitleq were parastin, ji ber vê yekê tu rayeyeke dewletan nîn e ku kesan veguherînin “hebûnên bêhêvî û ji civakê heta hetayê dûrxistî”. Di vê bûyera şênber de dadgeh gihîştîye wê encamê ku pergala ku destûrê dide ku sizaxwarî jiyana xwe ya mayî bêtî tu ihtimala berdana bimerc di girtîgehê de derbas bike, ew pergala li dijî qanûnan e. Li gorî vê, ji bo hemû sizaxwariyên sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî lê birî piştî ku herî kêmtî 15 salên wan di girtîgehê de buhurî nirxandina jinûve bûye mecbûrî. Ev nirxandin wê yekê di nava xwe de dihevwîne ku xeternakbûna sizaxwariyan û potansiyela wan a ji nû ve tevlêbûna nava civakê bi awayekî objektîf were lêkolînkirin û venihartin. Bi vî awayî, Dadgeh wê yekê bi biryareke şên-

ber diyar dike ku ihtimala guherîn, pêşketin û yekparebûna jinûve ya bi civakê re nikare bê tunehesibandin, wisa jî hîştîye ku mafê hêviyê weke hêmaneke mecbûrî ya rûmeta mirovan li pergala hiqûqê were bicîkirin.

2. Pêşîneyên Dadgehî yên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê: Avakirina Darazî ya Mafê Hêviyê

Her çend di Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê de mafê hêviyê wekî mafekî cûda nehatibe dayîn jî, ev maf bi pêşîneyên dadgehî yên DMMEyê û di çarçoveya xala 3yem a Peymanê de (qedexeya îşkence û miamela yan sizayê nemirovane yan biçûkker) hatiye bipêşxistin. Dadgehê ev maf têkildarî binbarîya parastina rûmeta mirovan a kesên bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî hatî sizakirin şîrove kiriye. Li gorî DMMEyê pergaleke ku di dema sizakirinê de tu ihtimala berdanê nade, ne li gorî rûmeta mirovan e û ev jî xala 3yem a Peymanê bînpê dike.

Pêşîneyên dadgehî yên DMMEyê yên têkildarî mafê hêviyê di sê qonaxan de derketine holê. Biryara Kafkarîs ji bo aşkerekirina prensîbên bingeîn, biryara Vinter û yên Din wekî xala werçerxê û biryarên Ocalan No.2, Kaytan, Gurban û Boltan weke tesbîtkerên pîrsgîrêkên sistematîk dikarin bîn senifandin.

2.1. Biryara Kafkarîs/Kibrisê

Di danîna bingeha darazî ya mafê hêviyê de gava yekem bi biryara DMMEyê ya Kafkarîs

li dijî Kibrisê hat avêtin. Serlêder angaşt kir ku sizayê girtîgehê yê hetahetayî di pratîkê de nayê kêmkirin; Dadgehê jî diyar kir ku di rejîma sizakirinê ya Kibrisê de ji aliyê teoriyê ve ihtimala berdana bimerce heye, lê pratîk tîjî nezelaliyan e û nikare bê pêşbînîkirin. Ev biryar giring e ji ber ku ev cara yekem bû ku Dadgehê cudahiya di navbera kêmkirina sizayî ya “de jure” (di qanûn de) û “de facto” (di pratîkê de) bi eşkereyî anî ziman. Ev biryar hem biryara yekem e ku pîvanên bingeîn ên têkildarî mafê hêviyê hatine diyarkirin hem jî tê de standardên bihûrgulî yên li ser naverok û prosedura kêmkirina sizayî hatine amadekirin û bipêşxistin.

2.2. Biryara Vinter û yên Din / Kraliyeta Yekbûyî

Di biryara Vinter de, ku yek ji bingeînên pêşîneyên dadgehî yên Dadgehê pêk tîne li ser mafê hêviyê, eşkere hatiye gotin ku sizayê girtîgehê yê hetahetayî bi serê xwe xala 3yem a Peymanê bînpê nake, lê dema ku dibe siza-yekî ku nayê kêmkirin, bi qedexeya miamela û sizayê nemirovane yan biçûkker re lev nayê. Di vê biryarê de DMMEyê cext lê kir ku kêmkirina sizayê divê hem di qanûnê de (de jure) hem di pratîkê de (de facto) hebe. Dadgehê her wiha weke standardekê diyar kiriye ku divê nirxandina jinûve xwe bîspêre mekanîzmayeke realist, liberdest, birêkûpêk û zela. Dadgehê diyar kiriye ku nirxandina yekem divê herî dereng di nava 25 salan de were kirin û eşkere got ku mekanîzmayên siyasî yên li ser efûkirinê nikarin şûna mafê hêviyê bigirin. Vê

nêrinê hîştîye ku mafê hêviyê weke kategoriyeke serbixwe ya mafan di hiqûqa mafên mirovan a Ewropayê de bê naskirin û berê dozên siberojê diyar kiriye.

2.3. Biryarên li ser Tirkîyeyê

a. Biryara Ocalan/Tirkîye (No. 2)

Biryara li ser Ocalan (No. 2) a 2014an li Tirkîyeyê xala werçerx e di pêşîneyên dadgehî yê nê mafê hêviyê de. Dadgehê diyar kir ku di hiqûqa sizakirinê ya Tirkîyeyê de ji bo kesên ku bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatine sizakirin bi rastî îhtimala berdana bimerce tune ye; û mekanîzmayên îstîsnaî yê wekî efûya serokkomariyê û efûya parlamentoyê ji ber nezelalbûna wan û tabîbûna wan a li biryara siyasî nikarin şûna parastina mafê hêviyê bigirin. Ji ber vê yekê biryar hatiye dayîn ku Tirkîyeyê xala 3yem a Peymanê bînpê kiriye û pîrsgirêk bi vî awayî hatiye rojava Komîteya Wezîran ji bo çavdêriya çibîckirina biryarê. Vê biryarê eşkere kiriye ku li Tirkîyeyê rejîma girtîgehê ya hetahetayî ya girankirî ne pîrsgirêkeke mafên mirovan a takekesî ye, lê pîrsgirêkeke avasaziyî ye.

b. Biryara Kaytan/Tirkîye

Biryara Kaytan a 2015an prensîbên biryara Ocalan (No. 2) piştrast kir û eşkere kir ku rejîma sizakirinê ya li Tirkîyeyê ji bo sizaxwariyên bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatî sizakirin tu îhtimala hêviyeke rastîn nade. Dadgehê careke din cext lê kir ku me-

kanîzmaya efûya Serokkomariyê nikare şûna nîrxandineke birêkûpêk, berdest û serbixwe bigire û biryar da ku xala 3yem a Peymanê hatiye bînpêkirin. Bi vî awayî DMMEyê cara duyem tesbît kir ku pergala sizakirinê ya heyî li Tirkîyeyê ji standardên bîngêhîn cihê bûye û ji wan dûr ketiye.

c. Biryara Koma Gurban / Tirkîye

Dadgehê di doza Gurban a 2016an de bi biryara xwe careke din cext lê kiriye ku li Tirkîyeyê rejîma sizayê girtîgehê yê hetehetayî yê girankirî bi xala 3yem a Peymanê re li hev nake. Bi behskirina ji biryarên berê yê nê Ocalan (No. 2) û Kaytan, Dadgehê diyar kiriye ku mewzûat tu îhtimala nîrxandinê an berdana bimerce li xwe nagire, ji ber vê yekê ji bi serlêderî re tu hêviya berdanê tune ye û di encamê de got ku mafê serlêder hatiye bînpêkirin. Dîsa vê biryarê eşkere bi bîr anîye ku divê dezgehên neteweyî mekanîzmayeke nîrxandinê ava bikin ku li gorî standardên di Vînter û pêşîneyên dadgehî yê nê din de dest-nîşankirî bin.

Vê tesbîtê ne tenê bînpêkirineke mafê kesekî eşkere kiriye; her wiha pîrsgirêkên avasaziyî yê nê rejîma sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî ji nîşan daye. Bi vî awayî biryara Gurban piştrast kiriye ku mafê hêviyê ji bo Tirkîyeyê ji asta serlêdanên takekesî hatiye bûye binbariyeke ji aliyê guhartinên pergali ve. Ji vê aliyê ve, ev biryar li nav pêşîneyên DMMEyê di bloka pêşîneyên dadgehî de ye ku taybetî

ji bo Tirkîyeyê ne û ev biryar ya sereke ye ku navê xwe daye koma biryaran (a Ocalan No.2, Kaytan, Gurban, Boltan) ku ji bo çavdêriya Komîteya Wezîran hatine pêşkêşkirin.

d. Biryara Boltan/Tirkîyeyê

DMMEyê di biryara xwe ya li ser Boltan a 2019an de diyar kir ku Tirkîye piştî biryara li ser Ocalan (No. 2) tu reformeke avasaziyî pêk neaniye û pirsgerêk ji takekesibûnê derbasî asteke giştî û pergalaî bûye. Ev tesbît bû xaleke din a werçerxê ku nişan dide ku di navbera rejîma sizayê hetahetayî yê girankirî ya li Tirkîyeyê û standardên Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê de nakokîyeke kûrtir peyda bûye. Dadgehê careke din bi bîr xist ku ji bo çibicîkirina mafê hêviyê divê pergalek bê avakirin ku ne tenê di teoriyê de, lê di sepandinê de jî karîger be û bixebite.

e. Biryarên Din ên Giring

Dadgehê piştî biryara Vinter û yê Din lêkolînek li ser sepandinên li welatên cûda jî kiriye û standardên xwe yê têkildarî mafê hêviyê xurttir kiriye. Van dozan hiştiye ku pîvanên berfireh û bihûrgilî bîr diyarkirin li ser kêmkirina sizayên girtîgehê yê heta dawîya emrê kesan û çawanîya mekanîzmayên venihartinê.

Bo nimûne, di biryarên Murray/Hollanda (2016) û Matioşaîtis/Litvanya (2017) de cext lê hatiye kirin ku tenê ne bes e ku mekanîzmayeke nîrxandinê di qanûnê de hatibe şewiran-

din; her wiha divê ev weke pergalekê jî hatibe bicîkirin ku di rastiye de karîger be, berdest be, destûrê bide pêşkeftina kesane ya sizaxwariyan û bihêle ku ew ji nû ve entegreyê civakê bibin. Li gel vê yekê, di biryara Hutchinson/Kraliyeta Yekbûyî (2017) de reformên ku Kraliyeta Yekbûyî piştî biryara Vinter pêk anîne, têrker hatine hesabandin û bînpêkirin nehatiye tesbîtîkirin. Ev nêzikatî jî nişan dide ku ji bo pergalaî ku pîvanên bingeîn ên zarûrî lê hatine bicîkirin Dadgeh jî dewletan re pareke teqdîrê (teserîfê) dihêle.

Di ser vê de jî, di serilêdana László Magyar/Macaristan de Dadgehê diyar kiriye ku tenê mekanîzmayêk efûkirinê ya bi teqdîra serokê dewletê ve girêdayî û ji garantiyên dadweriyê xalîkirî ji aliyê mafê hêviyê ve bes nîn e. Di biryara Petukhov/Ukrayna (No. 2) (Daîreya Mezin) de hatiye eşkerekirin ku kêmkirina sizayê tenê ji ber giraniya tawan nikare bê vederkirin, divê teqez pêşketina sizaxwariyan a bi domana demê re li ber çavan bê girtin û her wiha kapasîteya wan jî bê nîrxandin ka amade ne ji bo ku ji nû ve entegreyî civakê bibin. Di biryara Bodein/Fransa de jî ji ber ku pergalê berdana bîmerc û nîrxandinê ya Fransayê berdest e û bi garantiyên darazî hatiye rapêçandin, bînpêkirin nehatiye tesbîtîkirin. Bi vî awayî Dadgehê nimûneyeke şênber pêşkêş kiriye ji bo modeleke hevaheng û lihevkerî. Her wiha serilêdanên wekî Marcello Viola (No. 2)/Italya û Bancsók û László Magyar (No. 2)/Macaristan jî di pêvajoyên nîrxandinê de bi-vênevêbûna garantiyên usûlî (alîkariya hiqûqî,

biryara ravekirî, venêrîn û şopandina darazî, mafê serilêdana jinûve) careke din nişan daye.

Ev biryar hemû piştrast dikin ku mafê hêviyê di pêşneyên dadgehî yên DMMEyê de bûye standardeke rûniştî û dewlet ne tenê bi birêkûpêkkirineke şeklî, lê bi avakirina mekanîzmayan binbar û erkdar in ku di fiiliyatê de karîger, şefaf û bigarantî bin.

2.3. Standardên ku Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê di Behsa Misogerkirina Mafê Hêviyê de Diyar Kirine

Pêşneyên dadgehî yên DMMEyê ku li jorê hatine nîqaşkirin, êşkere kiriye ku mafê hêviyê ne tenê têgiheke razber e, lê mafek e ku weke beşeke xala 3yem a Peymanê divê bi standardên şênber were misogerkirin. Dadgehê di biryarên Kafkaris, Vinter, Murray, Matioša-itis, Hutchinson û Tirkiyeyê de nêzîkatîyek ava kiriye û bi saya vê nêzîkatîyê jî prensîbên bingehîn ên jêrîn tesbît kirine:

- **Şerta Kêmkirinê:** Sizayên girtîgehê yên hetahetayî yên girankirî tenê dema ku bi hiqûqî (de jure) û di pratîkê de (de facto) dikarin bên kêmkirin û jî nû ve nirxandin, hingê bi DMME re hevaheng in.
- **Rêzika 25 salan û venihartina periyodîk:** Di biryara Vinter de Dadgehê diyar kiriye ku sizayên heta dawîya emrê kesane divê herî dereng piştî 25 salan bên nirxandin. Li pey nirxandina yekem, di rewşa redkirina daxwazê de, di navberên maqûl de lêkolînên periyodîk divê

bên kirin. Cexta DMMEyê ya li ser 25 salan ji ber biryarên peywendîdar ên Mahkemeya Siyazî ya Navneteweyî (MSN) ye ku bi Rêzîknameya (Statute) Romayê hatibû avakirin û piraniya dewletên endamê Konseya Ewropayê jî tê de 121 Dewlet aligirên vê rêzîknameyê ne.

- **Gerdûnîbûn:** Mafê hêviyê cureyê tawanên sizaxwariyan an nasnameya wan her çi be jî, standardeke gerdûnî ye ji bo hemû girtiyên ku bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatine sizakirin. Ji ber ku li ser prensîba rûmeta mirovan disekine, nabe ku ev maf bi kategoriyên diyarkirî re were sînordakirin.

- **Naveroka mekanîzmayê:** Pêvajoya nirxandinê divê guhartinên girîng ên di jiyana girtiyên de û kapasîteya wan a vegera li jiyana civakê bide ber çavan. Divê were nirxandin ka gelo pêkanîna (infaza) sizayê hê jî xwe dispêre sedemên sizanasiyî yên meşrû (wekî sizakirin, pêximkerî / jêvegerandin, ewlehiya giştî) (Murray/Holanda).

- **Çawaniya mekanîzmayê:** Desteya nirxandinê ne mecbûr e ku yeke darazî be; lê divê serbixwe û tabiyê rêzîkên qabili pêşbînîkirinê û êşkere be; mafê wê yê teqdîrê divê bêsînor nebe (Iorgov/Bulgaristan (No. 2), T.P. û A.T./Macaristan). Pêwîst e ku ev destê ji otorîteya siyasî serbixwe be û biryarên wê vekirî bin bo venêrîn û çavdêriya darazî.

- **Nebesbûna efûya serokkomariyê yan jî mekanîzmayên siyasî:** DMMEyê cext lê kir ku

amûrên îstisnâî û siyasî yên wekî efûya serokkomariyê û ya parlamentoyê ne garantiyên têrker û bes in ji bo pêkanîna mafê hêviyê (Ocalan (No.2), Kaytan).

- **Garantiyên usûlî:** Divê garantiyên usûlî yên wekî beşdarbûna aktîf a girtiyan li pêvajoyê, alîkariya hiqûqî, biryara ravekirî û venêrîn û çavdêriya darazî bên peydakirin. Heke na, mekanîzmaya venihartinê / nixxandînê kêrnehatî dibe (Matioşaitis/Lîtwanîya).

- **Binbariya reformkirinê:** Dadgehê di biryara Hutchinson de reformên bi destê Kaliyeta Yekbûyî piştî biryara Vinter kirî bes û têrker hesabandine û tesbîta binpêkirinê nekiriye. Ev jî nîşan dide ku eger dewlet ne tenê li ser kaxizê, lê bi rastî jî pergalekê ava bikin ku tê sepanandin û bi rê ve diçe, hingê dikarin bi Peymanê re hevahengiyê pêk bînin.

2.4. Hiqûqa Berawirdkirî: Sepandinên li Ewropayê û Modelên Cuda

Tê dîtîn ku standardên têkildarî misogerkirina mafê hêviyê ne tenê bi pêşîneyên dadgehî yên DMMEyê tên piştrastkirin, her wiha ev standard bi berawirdkirina bi pergala sîza û înfazê yên dewletên endamê Konseya Ewropayê jî tên xurtkirin. Lêkolînên hiqûqa berawirdî hem pratîkên erênî hem jî kêmasiyên ku nîgeraniyê diafirînin êşkerekî dîkin û îmkânên lihevhatinê yên şênber berçav dîkin ji bo Tirkiyeyê.

Rejîma “whole life order”ê (sîzayê mîtleq ê hetanî dawîya temenê mirov û bêtî ihtimala

berdana bimerca) ya li Kraliyeta Yekbûyî sepanî ji hêla DMMEyê ve di biryara Vinter de li dijî Peymanê hatiye nixxandîn. Reformên piştî vê biryarê hatî kirin di biryara Hutchinson de hatine nixxandîn û têrker û bes hatine hesabandin. Ev nimûne jî nîşan dide ku Dadgehê sêwirandina mekanîzmayeke venihartina/nixxandina di nav 25 salan de weke standardêke bingehîn pejirandiye.

Li Elmanyayê pergala ku di sîzayên hetahetayî de piştî 15 salan nixxandinekê pêwîst dike, DMMEyê jî ber pîvanên wê yên venêrîn û çavdêriya birêkûpêk û pêşbînîbar der heqê wê de nixxandînen erênî kirine.

Li Fransayê piştî ku maweya mecbûrî ya kêmtirîn a sîzakirinê temam dibe, ku ev jî di navbera 18 û 22 salan de ye, nixxandineke darazî tê kirin. Di biryara Bodein de Dadgehê qebûl kiriye ku pergala fransîzî pir kêmtir caran bi rastî “sîzayê hetahetayî”yê disepîne û bi vî awayî jî mafê hêviyê nas dike; di sa li vir jî meyla ewropî ya venihartina / nixxandina piştî 25 salan dupat kiriye.

Piştî biryara Matioşaitis, Lîtwanîyayê pergala xwe jî nû ve ristiye; piştî 20 salên sîzakirinê mekanîzmayeke nixxandînê ya vekirî bo çavdêriya darazî, li ser bîngeha biryarên ravekirî, periyodîk û zelal aniye. Komîteya Wezîran ev guhartin erênî hesabandine.

Slowakyayê jî reformin pêk anîne ku pêwîstiyên mafê hêviyê bi cih tînin; Slowakyayê

pêvajoyeke nîrxandina darazî lê kiriye ku piştî 25 salên di girtîgehê de hem girtî hem jî kesên sêyem dikarin li ser navê girtiyan serî lê bidin.

Her çend Holandayê piştî temambûna 25 alan bi venihartin / nîrxandineke bihûngilî û pirqat û serilêdana ji bo efûyê di sala 27an de ji bo mafê hêviyê çarçoveyek danîbe jî, ji ber ku biryar di teqdîra teqez a desthilatê de ye, pergala zelal nîn e û pratîka berdanê pir sînordar dimîne, ev pergala wê hatiye rexnekirin.

Macaristanê li gorî biryarên DMMEyê guhartinên qanûnî kiriye; lê ji ber maweyên zêde dirêj ên bendêmanê yên wekî 40 salan, pergala efûkirinê ya ji kontrola siyasî re vekirî û nebûna garantiyên prosedurî, ev welat hê jî ji dûr e ji pêkanîna avasaziyeke hevaheng bi Peymanê re.

Li Îtalyayê rejîma ergastolo ostativo heye ku têgiheke xweserî hiqûqa sizayî ya Îtalyayê ye û bi taybetî bi biryara Marcello Viola (No. 2) ve hatiye rojevê. Bi wateya xwe ya peyvî tê maneya girtina hetahetayî ya bi armanca astengkirinê (ostatîf). Di hiqûqa îtalyanî de, girtiye bi sizayê hetahetayî bo sûcên wekî “teror, mafya û sûcên rêxistinkirî” sîza kirî eger bi dewletê re hevkarîyê nekirina yan jî bi nêrîneke din, eger li xwe mikur nehatina yan jî agahî nedana, bi tu awayî ji berdana bimerce sûdewer nedibûn. Ev rewş pîrsgirêkeke avasaziyê nîşan dide ku mafê hêviyê ji holê radike.

Bi giştî, li gelek welatên endamê Konseya Ewropayê verastkirin û birêkûpêkkirin di me-

riyetê de ne ku mafê hêviyê nas dikin. Di van pergalan de hêmanên hevpar ev in: venihartin / nîrxandina darazî ya piştî temambûna demeke diyarkirî; rêyên çavdêrîkirin, serilêdan û temyîzê yên periyodîk, pîvanên êşkere û qabilî pêşbînîkirinê û bisinorkirina rayeya teqdîrê ya kêfî ya kargêrî.

Rejîma înfazê ya sizayê hetahetayî yê giran-kirî li Tirkiyeyê di îstîqameteke berevajiyê van standardên hevpar bi rê ve diçe; mafê hêviyê ne di pratîkê de ne jî di hiqûqê de nade girtiyan. Ezmûna berawirdî careke din êşkere dike ku mafê hêviyê ne îstîsnai, lê binbarî û berpirsyariyeke gerdûnî û qabilî sepandinê ye.

“Mafê hemû girtiyan e ku der heqê qanûn û rêzîknameyên heyî de û
der heqê mafên xwe de bîn agahdarkirin.”

- Rêzîkên Mandela

Beşa Sêyem

PERGALA TIRKIYEYÊ YA SIZAYÊ GIRTÎGEHÊ YÊ HETAHETAYÎ YÊ GIRANKIRÎ: ÇARÇOVEYA HEYÎ YA HIQÛQÎ Û KARGÊRÎ

1. Rakirina Sizayê Mirinê

• Qanûna bi hejmara 4771an a 3ê Tebaxa 2002yan înfaza sizayên darvekirinê di dema aştiyê de rakiriye.

• Piştî vê qanûnê, sizayên darvekirinê yên kesên ku bi sizayê mirinê hatî sizakirin bo sizayê girtîgehê yê hetahetayî yan jî sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatine guhartin.

• Her wiha rakirina sizayê mirinê jî weke beşek ji pêvajoya hevahengiya bi Yekîtiya Ewropayê re û weke berpirsiyariyeke navneteweyî ya Tirkiyeyê hatiye şîrovekirin.

• Qanûna hejmar 5218 a 14ê Tîrmeha 2004an sizayê mirinê bi tevahî jî mewzûata Tirkiyeyê derxistiye.

• Xala 38an a Destûra Bingehîn jî hatiye guhartin; şer û rewşa awarte jî tê de di tu şert û mercan de cih bo sizayê mirinê nehatiye dayîn.

• Di encamê de, sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî di sistema hiqûqî ya Tirkiyeyê de bûye sizayê herî giran.

• Li gorî Xala 104(16) a Destûra Bingehîn serokkomar xwedî wê rayeyê ye ku “di rewşa nexweşiya kronîk, seqetî yan jî pîrbûnê de

sizayan sivik bike yan ji efû bike”. Lê belê ev mekanîzma ji bo armancên takekesî, awarte û mirovî hatiye fikirîn; cihê venihartin û nirxandina serbixwe û birêkûpêk a DMMEyê xwastî nagire. Dadgehê di biryara xwe ya Ocalan / Tîrkiye (No. 2) de ev tesbît kiriye.

Her çend sizayê mirinê hatibe rakirin jî, rejîma sizayî ya hetahetayî ya girankirî ku şûna wê girtiye, tu perspektîfeke serbestberdana bimerc nade; ji ber vê yekê, ev siza di pratîkê de wekî ‘sizayê mirina di jiyane de’ ye.

2. Sizayê “Heta Mirinê di Girtîgehê de Man”ê: Xalên Krîtîk ên di Mewzûatê de

Li Tîrkiyeyê sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî piştî rakirina sizayê mirinê hatiye naskirin. Piştî guhartineke yasayî di cotmeha 2001an de, sizayê mirinê hate rakirin ji bilî “sûcên şer û terorê”. Piştî de tebaxa 2002yan de sizayê mirinê ji bo hemû sûcan hate rakirin ji bilî sûcên ku “di demên şer de yan di bin gefeke nêzîk a şer de” hatibin kirin. Di encama van guherandinan de sizayên mirinê yên ku di sala 2001an de ji bo sûcên ji bilî “sûcên terorê” hatibûn birin li sizayê hetahetayî yê girankirî hatin guhartin; di sala 2002yan de hemû girtiyan ku bi mirinê li girtîgehên Tîrkiyeyê dihatin ragirtin, sizayên wan li sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatin veguhartin. Lê belê, piştî rakirina sizayê mirinê, heta sala 2005an—dema ku rejîma înfazê ya sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî di qanûnan de hat pênasakirin—ne diyar bû ku

dê kîjan rejîma cîbicîkirinê ji bo kesên bi vî sizayî hatine mehkûmkirin were sepanandin. Di vê heyamê de, şert û mercên girtîgehê yên van girtiyan neguherîn. Rejîma înfazê ya sizayê hetahetayî yê girankirî bi Xala 25an a Qanûna Hejmar 5275 a Derbarê Cîbicîkirina Sizayên Sûcan û Tedbirên Ewlehiyê de hatiye birêkûpêkkirin.

- Li gorî Xala 25an a Qanûna Înfazkirina Sizayan girtiyan ku sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî li girtîgehên girtî yên ewlehiya bilind tên ragirtin; ew di hucreyên tekekesî de tên bicîhkirin û mafên wan ên serdan û çalakiyan sînordar in.

- Xala 107an a Qanûna Înfaza Sizayan maweyên berdana bimerc bi rêk û pêk dike. Li gorî vê, ji bo sizayê hetahetayî yê girankirî 30 sal divê bîrê kişandin û ji bo çend sizayên hetahetayî yên girankirî û salên dirêj ên lê zêde kirî divê 36 sal bîrê temamkîrin. Lê belê li gorî xala 107/16 a Qanûna Înfaza Sizayan, mafê berdana bimerc ji bo sûcên li dijî nîzama destûrî û ewlehiya dewletê bi temamî hatiye rakirin. Ev xal (107/16) e ku dibe sedema ji nebûna mafê hêviyê. Ji ber wê yekê ye ku ji bo hin girtiyan, ji aliyê yasayî ve qet îmkaneke berdana bimerc tune ye. Bînpêkirinên ku ji aliyê Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê ve di biryarên xwe yên di dozên Ocalan dijî Tîrkiyeyê (No. 2) û Kaytan li dijî Tîrkiyeyê de hatine destnîşankirin, ji ber vê xalê çêdibin.

- Qanûna Hejmar 5275, Xala 107/16: “Li gorî Qanûna Sizayî ya Tîrkiyeyê ya Hejmar 5237,

Pirtûka Duyem, Para Çarem, Beşa Çarem a bi navê ‘Sûcên li Dijî Ewlehiya Dewletê’, Beşa Pêncem a bi navê ‘Sûcên li Dijî Pergala Destûrî û Rêveçûna Wê Pergalê’, û Beşa Şeşemîn a bi navê ‘Sûcên li Dijî Parastina Neteweyî’, nayên girêdan bi xalên der barê berdana bimerce ve.”

- Xala Veguhêz a 2(1)ê ya Qanûna hejmar 5275: “Li gorî Qanûna li ser Guhartina Çend Qanûnan a hejmar 4771 a 3yê tebaxa 2002an, ya ku ji aliyê Xala 1em a Qanûna hejmar 5218 a 14ê tîrmeha 2004an ve hatiye guhartin; tawanbarên ji ber tawanên terorê sizakirî sizayên wan ên mirinê li sizayê girtîgehê yê hetahetayî hatine guhartin û tawanbarên terorê yên ku sizayên wan ên mirinê li sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatine guhartin an jî yên ku bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatine sizakirin, dê mafê berdana bimerce ji wan re çênebe. Ji bo van kesan, sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî dê heta dawîya jiyana wan bidome.”

- Qanûna 17an a Qanûna Dijeterorê ya hejmar 3713: “Sizayên mirinê yên ku ji aliyê Qanûna 1em a Qanûna bi hejmara 5218an a 14ê tîrmeha 2004an ve hatine veguherandin bo sizayê hetahetayî yê girtîgehê, wekî ku ji aliyê Qanûna 3yem a 8/2002 û hejmar 4771 a li ser Guherandinên di Zagonên Cûrbecûr de û kesên ku sizayê wan ê mirinê hatiye veguherandin bo sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî yan jî kesên ku bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatine sizakirin, mafê wan ê berdana bimerce tune ye. Ji bo kesên

wiha, sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî dê heta mirinê bidome.”

- Xala 5an a Qanûna Dijeterorê ya hejmar 3713 diyar dike ku sizayên ku li gorî vê qanûnê tên dayîn dê bi qasî nivî were zêdekirin û destnîşan dike ku li şûna sizayê hetahetayî, sizayê hetahetayî yê girankirî dê were dayîn. Kesên li gorî vê qanûnê bi sizayê hetahetayî yê girankirî hatî sizakirin sizayê wan wekî “ragirtina li girtîgehê heta mirinê” pêk tê.

- Xala 47an a Qanûna Sizayî ya Tirkîyeyê: “Sizayê hetahetayî yê girankirî heta dawîya jiyana wan girtiyan didome ku bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatine sizakirin û li gorî rejîma ewlehiyê ya tund bi rê ve diçe ku di qanûnan de û di rêzîknameyên ji aliyê serokkomar ve weşandî de hatiye diyarkirin.”

3. Kêmbûna Daneyan û Pirsgirê-ka Şefafbûnê

Daneyên fermî ji gel re statîstîkên birêkûpêk, berfireh û rojane yên der barê hejmar û profîla girtiyan ku li Tirkîyeyê sizayê hetahetayî yê girankirî dikişînin, peyda nakin. Saziyên çavdêriyê yên navneteweyî bal kişandine ser vê kêmasiya daneyan. Di dema rûniştinên Komîteya Wezîran û Komîteya Neteweyên Yekbûyî ya li Dijî Îşkenceyê de, ji Tirkîyeyê daneyên hejmarî yên berbiçav hatine xwestin; lê belê, bersivên Tirkîyeyê sînordar bûne. Ev rewş her wiha li pêşberî DMMEyê û Komîteya Wezîran jî bi berdewamî dibe mijareke rexneyan.

Daneyên herî dawî yê li ser hejmara girtiyên ku sizayê hetahetayî û sizayê hetahetayî yê girankirî di girtîgehên Tirkiyeyê de dikişînin, di sala 2014an de ji aliyê Wezareta Dadê ve hatibûn weşandin; ji ber derbasbûna demê, ev dane êdî ne rojane ne. Di raporên Statistîkên Sizayî yê Salane (SPACE) yê Konseya Ewropayê de ji bo pênc salên dawî, daneyên der barê girtiyên ku sizayê hetahetayî û sizayê hetahetayî yê girankirî dikişînin, ku ji aliyê Wezareta Dadê ve hatine pêşkêşkirin, bi hev re hatine pêşkêşkirin; lê belê, der barê girtiyên sizayê hetahetayî yê girankirî tu hêviya berdanê nîn e, tu daneyêke taybet nehatiye parvekirin.

Di rûniştina 80yem a Komîteya li Dijî Îşkençeyê de, ku ji 16 heta 18ê tîrmeha 2024an li Cenevreyê hat lidarxistin, Fatih Güngör, Cîgirê Rêveberê Giştî yê Girtîgeh û Navendên Binçavkirinê, ku li ser navê Tirkiyeyê axivî, diyar kir ku hejmara girtiyên ku sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî dikişînin, ji sedî 1,24ê tevahiya nifûsa girtîgehan pêk tîne. Lêbelê, hat destnîşankirin ku ev nîrxandin tenê kesên bi sizayên teqezkirî vedihewîne û kesên di qonaxên lêpîrsinê yan dozgeriyê de nagire nav xwe; ji ber vê yekê, wê bi tevahî bandora giştî ya li seranserê welêt nîşan nedida. Wekî encama vê hejmarê, rêxistinên cîvaka sîvil ên ku lêkolînên taybetî di vî warî de dikin, texmîn dikin ku li Tirkiyeyê “zêdetirî 4.000 girtiyên bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî” hene.

Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê di

nîrxandina Koma Gurban de her wiha bal kişand ser kêmasiya daneyan a derbarê girtiyên ku sizayê girtîgehê yê hetahetayî dikişînin bêtî hêviya berdanê û pêşniyar kir ku ev agahî heta îlona 2025an bi awayekî berbiçav bêne pêşkêşkirin.

Wekî din, Komîteyê pêşniyar kiriye ku sepandina sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî were revîzekirin. Ji bo misogerkirina rastbûna daneyên îstatistîkî, pêwîst e ku Wezareta Dadê û Enstîtuya Îstatistîkî ya Tirkiyeyê (TÜİK) politikayêke weşandina daneyan a şefaf bi pêşbixin û daneyên ku li gorî kategoriyan hatine dabeşkirin (di qonaxên lêpîrsin û darizandinê de) eşkere bikin.

4. Rejîma Înfazê ya Sizayê Girtîgehê yê Hetahetayî yê Girankirî û Bandora Abdullah Ocalan

4.1. Rakirina Sizayê Mirinê û Li Şûnê Anîna Rejîma Înfazê ya Sizayê Hetahetayî yê Girankirî

Rastiyeke bæguman e ku pêvajoya dîrokî û normatîf a der barê rejîma hetahetayî ya girankirî de, rasterast bi darizandin û sizayê Abdullah Ocalan ve girêdayî ye. Sizayê mirinê yê ku di sala 1999an de li Ocalan hatibû birin, di rastiye de nehat çibîcîkirin ji ber ku Tirkiye di pêvajoya hevahengîya bi Peymana Ewropayê ya Mafên Mirovan re bû. Zexta navneteweyî ya xurt a ji bo rakirina sizayê mirinê, di çarçoveya têkiliyên Tirkiyeyê yê bi Konseya Ewropayê û Yekîtiya Ewropayê re, bû sedem ku ev sizayê mirinê bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî

yê girankirî were guhartin. Bi rastî, piştî rakirina sizayê mirinê, hem pênasîya normatîf a sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hem jî cîbicîkirina wê di bin rejîma herî tund a sepandinê de, bi giranî di çarçoveya siyasî û yasayî ya ku ji aliyê doza Ocalan ve hatibû afirandin de hatin şekildan, û her wiha di literatûrê de wekî destpêka pêvajoya ‘mirina sîvil’ jî hatine tomarkirin. Vê rewşê bîngehek peyda kiriyê ji bo nîqaşkirina sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî di çarçoveya mafê hêvîkirinê, rûmeta mirovan û Xala 3yem a Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê de. Birêkûpêkkirinê yasayî yên ku di sala 1999an de û beriya wê salê—dema ku Ocalan anîn Tirkîyeyê—di meriyetê de bûn û minakên sepandina wan, ji bo nîrxandina wê yekê giring e ka gelo sizayê ‘heta mirinê di girtîgehê de mayîn’, yê ku paşê di yasayê de hat bicîkirin, bi norm û nîrxên bîngehînan ên yasayî re li hev dike yan na. Di dema veguhêz a ji desthilatdariya leşkerî bo ya sîvil de, du sizayên dawîn ên mirinê di dîroka Komara Tirkîyeyê de di sala 1984an de hatin cîbicîkirin. Piştî van darvekirinan, Tirkîyeyê moratoriyûmek li ser bikaranîna sizayê mirinê ragihand û cîbicîkirina hemû sizayên mirinê rawestand. Ji cotmeha 1984an pê de, Konseya Ewropayê Komara Tirkîyeyê weke dewletekê nas û tomar kir ku tê de li ser sizayê mirinê moratoriyûmek tê sepandin.

Wekî din, Komara Tirkîyeyê, li gel 41 dewletên endamên Konseya Ewropayê, deklarasyona dawîn a ku di Lûtkeya Serokên Dewlet û Hikûmetên Konseya Ewropayê de di 11ê

cotmeha 1997an de bi yekdengî hatibû qebûl kirin, îmze kir.

Di vê deklarasyonê de tê gotin ku “beşdaran banga rakirina sizayê mirinê li seranserê cîhanê kirin û îsrar li ser domandina moratoriyûmên heyî yên li ser sizayên mirinê yên li Ewropayê kirin”. (Deklerasyona Dawîn a Lûtkeya Duyemîn a Serokên Dewlet û Hikûmetên Konseya Ewropayê; Strasbourg, 10-11ê cotmeha 1997an) Moratoriyûm bi rêya ragirtina dozên mirinê hat cîbicîkirin di komîteyêke pêşîn de bêyî ku ew bîna li Meclîsa Mezin a Neteweyî ya Tirkîyeyê bîna pêşkêşkirin. Li gorî prosedûra yasayî, dosyeyên têkildarî sizayên mirinê yên temamkirî ji aliyê Wezareta Dadê ve ji Ofîsa Serokwezîr re hatin şandin; piştî vê pêvajoyê, dosye, ku wekî “Tezkereya Serokwezîr” ji Serokatiya Meclîsa Mezin a Tirkîyeyê (TBMM) re hatibûn şandin, paşê ji Komîteya Dadê re hatin şandin.

Piştî nîrxandina pêşniyarê di Komîteya Dadê de, rapora ku ji bo cîbicîkirina sizayê mirinê hatibû amadekirin, piştî nîqaşkirina li Civata Giştî ya Meclîsa Mezin a Neteweyî ya Tirkîyeyê, ji bo dengdanê hat pêşkêşkirin; heke bihata pejirandin, ji bo pesendkirinê ji serokkomar re dihatê şandin. Piştî ku serokkomar ew pesend kir û di Rojnameya Fermî de hat weşandin, siza hat cîbicîkirin. Lê belê, dozên sizayê mirinê yên ku ji TBMMê re hatine pêşkêşkirin, ji sala 1984an ve bêyî ku bikevin rojeva Komîsyona Dadê, hatine rawestandin. Ji wê rojê ve, tu dozeke sizayê mirinê nehatiye

pêşkêşkirin bo rojeva TBMMê; li ser redkirin an pejirandina wan dengdanek nehatiye kirin.

Weke encam, navbera sala 1984an ku dema moratoriyûmê ye, û sala 1999an, ku Ocalan anîn Tirkiyeyê, parlamentoyê derbarê cîbicîkirina sizayê darvekirinê de tu biryar negirtine.

Vê mijarê der barê rewşa kesên ku sizayê darvekirinê li wan hatiye birîn de valahiyeke yasayî çekiriyê. Tenê bi lêkolîna rêzîkname û pratîkên yasayî yên wê demê, mimkin e ku were diyarkirin ka ew ê bi çi awayî sizayê wergirin û rejîma darvekirinê dê çawa were sepandin. Saziyên herî zêde yên di wê demê de derbasdar, li gorî bendê 19an a Qanûna Cîbicîkirina Saziyan a hejmar 647 a 13ê tîrmeha 1965an, ya ku berdana bimerc bi rê ve dibe, bi guhertina ku li gorî bendê demborînî yê Qanûna hejmar 3267 a 11ê adara 1986an hatibû kirin, hatibûn diyarkirin. Li gorî vê yekê, “kesên ku Meclîsa Mezin a Neteweyî ya Tirkiyê biryar daye sizayê mirinê bo wan neyê cîbicîkirin dê 30 salan, kesên ku sizayê girtîgehê yê hetahetayî li wan hatiye birîn dê 20 salan, û kesên ku sizayên din ên girtîgehê li wan hatine birîn dê bi qasî nivê sizayê xwe bixebitin û bi şertê ku li gorî Rêzîknameyê refstarên wan baş bin, dê hetta bêyî ku daxwaz bikin jî bi berdana bimerc werin berdan.”

Di sala 1991an de bi xalên veguhêz ên li qanûna bi hejmara 3713an hatî zêdekirin hin verastkirin û birêkûpêkkirin hatin kirin ku dê

wekî efûyeke qismî bihatina pênasêkirin. Li gorî xala veguhêz a 4em, ji bo sûcên heta 8ê nîsana 1991an kirî, sizayên mirinê ji bo girtiyên bi sûcên siyasî tawanbar kirî weke 20 salan û sizayên hetahetayî jî weke 15 salan hatin verastkirin. Li gorî heman xalan, ji bo sûcên ku piştî 8ê nîsana 1991an hatine kirin, sizayê mirinê weke 36 salan û sizayê hetahetayî jî weke 30 salan hatin destnîşankirin. Weke encam, sizayê mirinê hem ji ber biryarên ku Tirkiye aliyê wan e hem jî ji ber moratoryûma Tirkiyeyê bi xwe eger metirsiyeke cîbicîkirinê nebûya, bi rêya sepandina maweyeke diyarkirî ya sizayê girtîgehê dihat cîbicîkirin. Ev mijar ne di encama dengdaneke li parlamentoyê, lê belê bi sepandina sizayekî girtîgehê li gorî sînoren herî bilind ên sizakirinê yên di qanûnan de dihat cîbicîkirin. Li gorî van verastkirinên qanûnî, di sala 1999an de, ku sala anîna Ocalan e bo Tirkiyeyê, tu kes, kesên bi sizayê darvekirinê hatî sizakirin jî tê de, her çend sizayê darvekirinê nedihat cîbicîkirin jî, ji ber dozekê jî 20 salan zêdetir li girtîgehê nehatibû ragirtin.

4.2. Bînpêkirina Prensîba Cudakarî û Wekheviyê di Sepandina Sizayê Girtîgehê yê Hetahetayî de

Ji dema ku Abdullah Ocalan di sibata 1999an de li girtîgeha ewlehiya bilind a li girava Îmraliyê hate bicîkirin, statuya wî di hema hema her qanûn û vezsazkirinê de ku li Tirkiyeyê hatiye kirin, bûye mijara nîqaşê û gelek caran xalên awarte yên bi taybetî ji bo wî amade kirî hatine danîn. Xalên taybet li qanûn û bel-

geyên birêkûpêkkirinan hatine zêdekirin da ku misoger bikin ku Ocalan ji efû, berdanên bimerc an kêmkirinên sizayî yên ji bo her kesî derbasdar sûdê wernegire û bi vî awayî rewşek hate afirandin ku ne li gorî prensîba wekhevîya li ber qanûnan e. Qanûna hejmar 4453 a 28ê tebaxa 1999an ji bo sûcên heta 23ê nîsana 1999an kirî efûyek derxist; lê belê xalên 125, 168 û 169an ên Qanûna Sizayî ya Tirkîyeyê (TCK), ku Ocalan ji li gorî wan dihat darizandin, ji çarçoveya vê efûyê hatin derxistin. Piştî, bi Qanûna hejmar 4610 a 8ê kanûna 2000an der barê berdana bimerc û paşxistina darizandinan de verastkirin hatin kirin, lê belê vê carê her çend ku xala 169an a Qanûna Sizayî ya Tirkîyeyê (TCK) di nav çarçoveyê de hatibû hiştin jî, xalên 168 û 125an ên TCKyê, ku cewhera wan yek e, jê hatibûn derxistin. Ev cudahî weke sepandineke cihêkar a bi taybetî ji bo vederkirina Ocalan hat şîrovekirin. Heman qanûnê ji bo girtiyên bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî hatî sizakirin kêmkirineke bi qasî 10 salî di sizayê de aniye, lê xala 125an a Qanûna Sizayî ya Tirkîyê dîsa ji çarçoveya wê hatiye derxistin. Tevî biryareke berê ya Dadgeha Destûrî ku cudahiyeke bi vî rengî betal kiribû, ev guhartin di dema serokkomariya Ahmet Necdet Sezer de ji bo betalkirinê bo Dadgeha Destûrî nehatiye şandin. Dadgehên herêmi angaşten nedestûribûnê yên der barê xala 125an de bi hinceta bêbingehbûnê qebûl nekirine û bi vî awayî rê li ber şandina mijarê bo Dadgeha Destûrî hatiye girtin. Lê belê heman îtiraz ji bo xalên din hatine qebûlkirin û Dadgeha Destûrî gelek biryarên betalkirinê derxistine. Bi Qanûna hejmar 4758 a 21ê gulana 2002yan, gelek xalên sûcan ku ji

çarçoveyê hatibûn derxistin ji nû ve lê hatin zêdekirin û sizaxwariyên ji ber wan li derve hiştî derfeta berdana bimerc bi dest xistine. Di gel vê yekê jî, xala 125an dîsa hatiye vederkirin û gelek sizaxwariyên ji ber vê xalê li derveyî vê çarçoveyê mane. Li gorî Qanûna hejmar 4771 a 3yê tebaxa 2002yan, sizayên mirinê bo sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatine guhartin. Lê belê xala 1/B ya heman Qanûnê diyar dike ku verastkirinên der barê berdana bimerc de ji bo “tawanbarên sûcên terorî” nayên sepanandin û vê verastkirinê hiştiye ku sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî bi rastî jî heta dawîya jiyanê were kişandin. Vê verastkirinê mafên bidestxistî pûç kirine û prensîba “qanûnên ne di lehê de nabe ku paşveger bin” bînpê kiriye. Qanûna Înfaza Sizayan a hejmar 5275 ev verastkirin pihêttir kirine û bi vî awayî rejîma girankirî ya înfazê ya ku niha li ser Ocalan tê sepanandin, yasayî kiriye. Wekî din, gelek mafên li gorî Qanûna bi hejmara 5275an ji hemû girtî û sizaxwariyan re hatî dayîn di pratîkê de li Ocalan nehatine sepanandin. Mafên wekî telefonkirin, hebûna televîzyonê yan jî hevdîtina bi aliyên sêyem re jê re nehatine dayîn. Ev rewş bûye sedema sepandineke hê dijiwartir a rêzîknameyên ku jixwe cihêkar bûn. Hin verastkirinên piştî biryarên DMMEyê rê li ber ji nû ve darizandinan vekirine û di wan de ji ji bo Ocalan îstisna hatine çekirin. Pêvajoya ji nû ve darizandinê ya ku li gorî Qanûna hejmar 4771an hatibû pejirandin, bi rêya xistina xalên demkî rê li ber serilêdana Ocalan girtiye. Heman astengî paşê di Qanûna bi hejmara 4793yan de û piştî li Qanûna bi hejmara 5271an a li ser CMKyê jî hatiye berdeawmkirin. Her çend

piştî biryara DMMEyê ya 12ê gulana 2005an ji nû ve darizandin pêwîst bû ji, ev pêvajo bi astengiyên yasayî yên ku hatibûn danîn bi awayekî fiilî hatiye astengkirin. Di vê navberê de hin birêkûpêkkirinên din ji hatine kirin ku li hevdtîna bi parêzeran re hebûna aliyekî sêyemîn û tomarkirina van hevdtînan ferz dike û parêzeran ji parastina kesan qedexa dike. Hedefa rasterast a van birêkûpêkkirinan Ocalan bû û ev bû sedema bînpêkirineke micid a mafê parastinê û nepeniya pêwendiyên di navbera parêzer û muwekil (xwesepêr). Ji sala 2011an pê de, hevdtînen parêzeran bi awayekî fiilî hatine astengkirin û weke hincetên fermî ji hin beyanatên ji pêbawerkirinê dûr hatine pêşkêşkirin, wekî 'keştî xirabe ye' yan 'hewa ji bo seyrûseferê neguncayî ye'. Raporên Komîteya Ewropayê ji bo Pêşilêgirtina Îşkenceyê (CPT) destnîşan kiriye ku ev kiryar ji hêla xwezaya xwe ve siyasî ne, ne hiqûqî ne. Piştî hewldana derbeya 15ê tîrmeha 2016an, tedbîrên ku di bin Rewşa Awarde (OHAL) de hatin girtin, mafên Ocalan û girtiyên din ên li Îmraliyê yên ji bo danûstandina bi parêzer, malbat, wasî û kesên din re asteng kirine; kanalên ragihandinê yên wekî telefon, telgraf û nameyan ji hatine qutkirin. Ev kiryarên di pratîkê de paşê bi rêya Biryarên di Hukmê Qanûnan de û bi qanûnan bo hemû girtîgehan hatin berfirehkirin û mafê parastinê û mafê ragihandinê bi awayekî tund sinordar kirin. Di encamê de, ji 1999an pê ve, ku sala veguhestina Ocalan e bo Girtîgeha Îmraliyê, hema hema her qanûn û birêkûpêkkirina hatî kirin rewşa wî ya taybet li ber çavan girtiye û wisa hatiye amadekirin. Ev pêvajo wêneyekî êşkere dike ku tê de prensîbên herî bingeşin

ên hiqûqa sizayî yên wekî wekhevî, qedexeya cudakariyê û prensîba ku 'qanûnên ne di lehê de nabe ku paşveger bin' hatine bînpêkirin û dişa birêkûpêkkirinên taybetî ji bo kesekî hatî amadekirin bi awayekî sistematîk hatine cîbicîkirin. Tevî biryara DMMEyê ya sala 2014an a der barê Ocalan de (No. 2), ku sepandina sizayê hetahetayî yê girankirî ya bêmerc wekî îşkenceyê pênase kiribû, Tirkiyeyê gavên di wî warî de neavêtine; berevajî vê yekê, tecrîda fiilî û rejîma înfazê ya girankirî domandiye. Ji ber vê yekê, rewşa Ocalan bûye yek ji mînakên herî berbiçav ji bo nîşandana bê ka hiqûqa sizayî û prensîbên mafên mirovan li Tirkiyeyê ji ber sedemên siyasî çawa hatine îstisnaîkirin.

Birêkûpêkkirina sizayê hetahetayî yê girankirî ya li Tirkiyeyê bi awayekî êşkere li dijî standardên navneteweyî yên mafên mirovan e, ji ber ku bi temamî ihtimala berdanê ji holê radike. Mercên înfazê yên li Ocalan sepanî yek ji mînakên herî berbiçav ên van bînpêkirinan derdixe holê. Ji ber ku mercên sizayê hetahetayî yê girankirî ku li Ocalan hatine sepanandin, ne tenê her ihtimaleke berdanê ji holê radike. Her wiha ew tabiyê rejîmeke tecrîda mitleq e ji ku ev yek bi salan ji mafê hevdtîna bi parêzer û malbatê re bêparmayîna wî xurtir dike. Ev rewş, li gorî xala 3yem a Peymanê ya ku îşkenceyê qedexa dike, bînpêkirineke e. Wekî din, li nav pêşniyarên Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê û CPTyê ji bo Tirkiyeyê hatiye destnîşankirin ku ev rejîma înfazê ne li gorî rûmeta mirovan e. Eger ev hemû sedem li ber çavan bên girtin, divê sepandina tecrîdê bi dawî bibe. Lê belê weke parçeyekî pêvajo-ya ji 23yê cotmeha 2024an pê de li Tirkiyeyê

dest pê kirî, her çend sînorkirî be jî, derfet ji Ocalan re hatiye dayîn ku bi parêzerên xwe û malbata xwe re hevdiîtinan bike. Ser pêşîn, dibe ku ev pêşketin wekî nermkirina mercên tecrîdê xuya bike, ji ber ku kesekî bi rejîma sizayê hetahetayî yê girankirî ragirtî cara yekem bi fîlî yek ji mafên xwe yên herî bingehîn bi kar tîne.

Lê belê xala ku divê li vir were tekezkerin ev e ku naskirina vî mafî ne wekî encameke xwezayî ya sistema sizayî ye yan jî li gorî daxwazên serweriya hiqûqê pêk nehatiye. Dayîna mafê Ocalan ê hevdiîtinan bi xizim û parêzerên xwe re ne wekî naskirina mafekî li ser bingeha standardên hiqûqî yên gerdûnî ye, lê belê li gorî pêdivî û meyldariyên pêvajoya siyasî pêk hatiye. Bi gotineke din, mafê hevdiîtinan bi malbat û parêzeran re mafekî bingehîn e ji hêla mafên girtiyan sizayê hetahetayî yê girankirî, lê ev maf bi rakirina mercên tecrîdê na, bi diyarkeriya dinamikên siyasî pêkan bûye. Ji ber vê yekê, her çend ev pêşketin ji aliyê naskirina mafên takekesî di çarçoveya mafê hêviyê de girîng be jî, ew pirsgrîkên avasaziya yên rejîma sizayê hetahetayî yê girankirî ya li Tirkîyeyê jî holê ranake. Berevajî vê yekê, ew pratîkeke cibîckirîne eşkere dike ku tê de pêvajoyên siyasî diyarker in, ne prensîbên gerdûnî yên hiqûqê. Xala 3yem a Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê, ya ku muameleya nemirovane yan xirab qedexe dike, xala 8an a ku mafê rêzgirtina li jiyana taybet û jiyana malbatî garantî dike û pêşîneyên dadgehî yên DMMEyê Tirkîyeyê binbar dikin û ev rewşa heyî hê jî ne li gorî pêwîstiyên van binbariyên Tirkîyeyê ye.

Li Tirkîyeyê, nîqaşên der barê ‘mafê hêviyê’ de di van demên dawî de ji nû ve derketine pêş. Ev nîqaş ji ber nîrxandinên siyasî û yasayî yên di qada giştî de ne ku li ser Ocalan çêdibin. Mafê hêviyê hemû wan girtiyan eleqedar dike ku bi sizayê herî giran, wate bi sizayê girtîgehm yê hetahetayî yê girankirî hatine sizakirin; ji ber vê yekê ev maf têkildar e bi mafên mirovan ên gerdûnî û prensîbên serweriya hiqûqê. Wekî ku di mehkûmîyetên DMMEyê de jî tê tezkirin, ji ber ku sizayê girtîgehmê yê hetahetayî mitleq e û nîrxandina jinûve nîn e, ev sîza rûmeta mirovan û prensîba “jiyaneke bihêvî” binpê dike. Her girtîyek, bêyî ku li giraniya sûcê ku kiriye bê nihêrîn, xwedî maf e ku piştî demeke diyarkirî li ser bingeha ihtimala ji nû ve entegrebûna civakê were nîrxandin. Di vê çarçoveyê de, “mafê hêviyê” ne tenê ihtimala ji nû ve bîdestxistina azadiyê ye; ew her wiha rengvedana rûmeta mirovan û mafê kesan ê entegrebûna civakê ye jî. Her çend ku di salên dawîn de atmosfera siyasî ya her aloztir li Tirkîyeyê hiştiye ku ev nîqaş ji perspektîfeke ewlehiyê ya tengtir werin nîrxandin, lê di bingeha xwe de ev mijar xwedî aliyên yasayî û mirovî yên pir berfirehtir e. Ji ber vê yekê, têkoşîna ji bo mafê hêviyê û daxwazên ji bo naskirina vî mafî pêwîst dikin ku hemû girtiyan bi sizayê hetahetayî yê girankirî hatî sizakirin di çarçoveyê hepar û berfireh de werin nîrxandin. Ev nêzîkatî giring e hem ji bo pabendbûna bi standardên navneteweyî yên mafên mirovan re hem jî ji bo bicîhkirina prensîbên edalet û wekhevîyê di nav pergala hiqûqî ya Tirkîyeyê bi xwe de.

“Hemû şêweyên ragirtîbûnê/ragirtinê divê bi wî awayî werin
biserûberkirin û vesazkirin ku jinûvetevlêbûna kesên ji azadiya xwe
bêpar kirî ya nava civaka azad hêsan bibe.”

- Rêzikên Girtîgehan ên Ewropayê

Beşa Çarem

BANDORA REJÎMA GIRTÎGEHÊ YA HETAHETAYÎ YA GIRANKIRÎ:

ALIYÊN WÊ YÊN MAFÊN MIROVAN Û TENDURISTIYÊ

1. Bandora rejîma înfazê li ser Tenduristiya Psîkolojîk û Fîzîkî ya Girtiyên Sizayê Girtîgehê yê Hetahetayî yê Girankirî

Sizayê ragirtina di hucreyê de û rejîma înfazê ya sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî dikarin bandorên neyînî yên giran li ser tenduristiya psîkolojîk û fîzîkî ya girtiyan bikin. Lêkolîn nîşan didin ku di navbera %33 û %90ê girtiyên sizayê hucreyê lê sepanî îhtimala wan a nîşandana semptomên cidî heye. Ev semptom ji bêxewî û serêşê heta anksîyete û depresyonê û ji halûsînasyonan heta psîkozê di skalayê berfireh de derdikevin pêşîya me.

Bandorên neyînî yên tecrîdê bi gelemperî di nav çend rojan de dest pê dikin û her ku dema vê sepanî dirêjtir dibe, ev bandor jî girantir dibin.

Girtiyên bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatî sizakirin ji ber îzolasyona demdirêj û nebûna têkiliya civakî, dibe ku ji van şert û mercan bêhtir bi giranî bandor bibin li gorî girtiyên din. Li gorî daneyên civaka sîvil û lêkolînên meydana yên ku di qada giştî de hatine ragihandin, ev hucreyên van girtiyan wisa hatine sêwirandin ku tîrêjen rojê rasterast ji hucreyan nagirin; ew piraniya rojên xwe li ber ronahiya çekirî (lambeyan) derbas

dikin. Hucreyên biçûk, hewakêşîya nebes û deriyên kilitkirî nefes û tevgerê sînordar di-kin û girtiyan neçar dikin ku piraniya rojê rûniştî bimînin. Ev rewş dikare bibe sedema pîrsgirêkên masûlkeyî-îskeletî, serêşên kronîk, nexweşiyên gera xwînê û pîrsgirêkên din ên tenduristiya fîzîkî.

Ji aliyê psikolojîk ve, ji ber ku bi salan bi kesên din re tu derfeta ragihandinê nîn e, ev yek pîrsgirêkên cidî derdixe ji bo girtiyan ku sizayê girtîgehê yê hetahetayî bêtî tu mafê efûkirinê dikişînin. Di tîkiliyên bi girtiyan re, taybetî bal tê kişandin ser nebûna sohbet û danûstandina civakî. Nebûna kesekî din ku pê re tîkilî were danîn dibe ku xebitandina hin şîyanên zihnî nemimkun bike û ev rewş dibe ku bibe sedema pîrsgirêkên bîr û konsantrasyonê. Her wiha, ev yek dibe sedema depresyon û ank-şîyeteyê.

Ji ber ku girtîgeh ji civaka sîvil û venihartina / çavdêriya akademîk re girtî ne, ev yek nahêle ku başbûna psikolojîk a girtiyan ji derve ve were şopandin. Psikolojiya mirovan aliyekî bîngêhîn e tenduristiya wan e û divê mercên girtîgehan jî li gorî vê rastiye were guncandin. Lêkolînkirin û tespîtkirina pîrsgirêkên psikolojîk gelekî giring e ji bo ku mirov tê bîgihêje ka bandorên zirardar ên vê rejîma înfazê çi ne li ser girtiyan ku bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî hatine sizakirin.

Li gorî birêkûpêkkirina hiqûqî ya tîkildar, ji bo girtiyan ku sizayê girtîgehê yê hetahetayîyê

giran dikişînin, cîbicîkirina sizayê nayê seki-nandin; divê tedbîrên tenduristiyê heta ku mimkin be di nav saziyê de bîn peyda kirin, ji bilî muayeneyên bijîşkî yan jî rewşên mecbûrî. Lêbelê, heke girtî ji bo dermankirinê hewceyî derveyî saziyê bin jî, divê ew di hucreyên yek-kesî de bimînin. Ev rewş gihîştina tenduristiyê zehmet dike û dibe ku rê li ber wan bigire ku ji lîstîkê û dermankirina pêwîst mifadar bin.

Ji ber vê yekê, divê pîrsgirêkên tenduristiyê yên psikolojîk û fîzîkî ku ji ber rejîma girtî-gehê ya girtiyan sizayê hetahetayî yê girankirî ji nexweşiyên din ên girêdayî girtîgehan cuda bîn nîrxandin. Ev kiryar bi awayekî eşkere hem standardên navneteweyî yên mafên mirovan hem jî mafê bîngêhîn e girtiyan e tenduristî û rûmeta mirovan bînpê dikin.

2. Prensîbên Hiqûqa Navneteweyî li ser Tecrîd û Sizayê Hucreyê

Di hiqûqa navneteweyî de der heqê sizayê hucreyê de sînordakirinên zelal hene. Li gorî Rêzîkên Mandela yê NYyê (xala 44an), eger girtîyek rojê 22 saetan an jî zêdetir ji her cure temasa bi mirovên din re dûr bê hiştin, ev weke sizayê hucreyê tê pênasekirin ve eger ev sîza ji 15 rojan dirêjtir biajo, ev wekî 'sizayê hucreyê yê demdirêj' tê qebûl kirin. Xala 43yan a heman Rêzîkan diyar dike ku sizayên hucreyê yên bo maweyeke nediyar an jî ji 15 rojan zêdetir qedexa ye. Di heman demê de, xala 45an cextê lê dike ku sizayê hucreyê tenê di mercên awarte de dikare were sepandin, divê bi qasî ku pêkan be kurt be û divê nebe

beşeke asayî ya sizayê girtiyan.

Di rêzikên Girtîgehan ên Ewropayê de jî birêkûpêkkirinên bi heman rengî hene. Bende 2yem û 3yem ên xala 43yan a vê belgeyê diyar dikin ku girtiyan di hucreyan de ragirti divê her roj ji kontrola bijîşkan derbas bibin û ev tişt divê di bin çavdêriya bijîşkan de were kirin. Wekî din, li gorî xala 60em, sizayê hucreyê tenê bo demên pir kurt dikare were sepandin.

Wek encam, rêzikname û birêkûpêkkirinên navneteweyî îzolasyonê tenê wekî tedbîreke dawîn qebûl dikin ji bo kesên xeternak an êrîşkar û diyar dikin ku herî zêde bo 15 rojan dikare bê sepandin. Di vê heyamê de jî, divê bijîşk girtiyan her roj hem ji aliyê fizîkî hem jî ji aliyê psikolojîk ve muayene bikin.

Komîteya Pêşlêgirtina Îşkenceyê ya Ewropayê (CPT) tekez dike ku sizayê hucreyê di hin şert û mercan de dikare bibe mîameleyeke nemirowane û biçûkker û ji ber vê yekê jî, divê her cure sizayê hucreyê bi qasî ku pêkan e kurt be. Li rapora CPTyê ya hezîrana 2013an, ku li ser Tirkiyeyê bû, hatibû destnîşankirin ku sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî wekî sizayê hucreyê tê hesibandin ji ber ku girtiyan rojê tenê saetek destûr heye ji bo werzîşa li derve û têkiliyeke watedar a mirovane nîn e.

Di hiqûqa sizayî ya Tirkiyeyê de sizayê hucreyê wekî sizayekî dîsîplînê hatiye diyarkirin û ji ber ku ji bo girtiyan bi sizayê hetahetayî yê girankirî sizakirî ev êdî bûye rêzîkek, ev rewş

tê wateya asayîbûn û normalbûna “sizayê di nava sizayê heyî de”. Bi vî awayî, ev pratîka ku ji sepandineke demkî ya ji bo reftarên diyarkirî wêdetir çûye û êdî ji bo girtiyan sizayê hetahetayî yê girankirî bûye sizayekî ji sinorkirina azadiya wan wêdetir çûyî.

Weke gotina dawîn, awayê sepandina sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî bi awayekî eşkere rêzikên di hiqûqa mafên mirovan de destnîşankirî bînpê dike.

CPT di hemû raporên xwe de diyar dike ku sizayê hucreyê zirareke cidî ya psikolojîk û fizîkî dide girtiyan. Sizayê hucreyê dikare bibe sedema stres, fikar û pîrsgirêkên tenduristiya fizîkî ji ber ku girtî tevahiya rojê ji hemû têkiliyan cîvakî bêpar dimîne û ji bo demên dirêj bi tenê tê hiştin. Ji ber vê yekê, divê sizayê hucreyê tenê ji bo demên kurt were sepandin û divê girtî di bin çavdêriyeke bijîşkî ya berdewam de be. Heke di dema sizayê de tenduristiya psikolojîk an fizîkî ya girtiyan bi awayekî neyînî bi bandor bibe, divê ev pratîk di cî de were rawestandî. Ev pratîk giring e hem ji aliyê standardên mafên mirovan ve hem jî ji bo ku tenduristî û rûmeta mirovan a girtiyan bê parastin.

3. Sizayê Girtîgehê yê Hetahetayî yê Girankirî û Mercên Ragirtina Girtiyan

Birêkûpêkkirin û rêziknameyên navneteweyî yên ku armanca wan parastina girtiyan ji bandorên neyînî yên sizayên girtîgehê yê dem-

dirêj e, tekez dikin ku ji bo xatirê rêzgirtina li rûmeta mirovan, divê derfet ji girtiyan re bê dayîn ku di dema înfazkirina sizayê de ji nû ve tevî civakê bibin û ji nû ve bibin endamekî/e civakê. Di vê çarçoveyê de, belgeyên wekî Rêzikên Standard ên Asgarî yên NYyê ji bo Miamelêkirina li Girtîyan (Rêzikên Mandela) û Rêzikên Girtîgehên Ewropayê bi zelalî diyar dikin ku divê girtî li gorî profilên xwe yên rîskî yên takekesî bîn nixrandin û divê hawîrdoreke dadmend bo wan were peydakirin ku tê de bikaribin ji serê dema sizakirî heta dawiya wê hêviya xwe ya ji nû ve bidestxistina azadiya xwe biparêzin.

Belgeyên wekî biryarên pêşniyarî yên Konseya Ewropayê li ser 'Ji Nû ve Tevlêkirina Civakê ya Girtiyên bi Sizayên Demdirêj Sizakirî' û 'Berdana bimerç' jî piştgiriya vê nêzîkatîyê dikin. Ev belge balê dikişînin ser pêwîstiya redbîrên pêwîst ji bo misogerêkirina ku girtî di mercên li gorî mafên mirovan de bîn ragirtin, ji bo ji nû ve entegrekirina wan a di nava civakê de bi rêya pêvajoyên entegrekirina jinûve û ji bo kêmkirina bandora psikolojîk a sizayên girtîgehê yên demdirêj li ser girtiyan.

Di Rapora xwe ya Giştî ya 11emîn de Komîteya Pêşilêgirtina Îşkenceyê ya Ewropayê (CPT) destnîşan kiriye ku li gelek welatên Ewropayê hejmara girtiyên bi sizayên hetahetayî sizakirî û girtiyên din ên demdirêj zêde bûye. Di hin serdanên xwe de, CPTyê tesbît kiriye ku rewşa girtiyên wiha di warê şert û mercên fizîkî, çalakî û derfetên têkiliya civakî de pir xirab bûye. Wekî din, gelek ji van gir-

tiyan rastî sînardarkirinên taybet tîn ku şert û mercên neyînî yên girtibûna demdirêj hîn xirabtir dikin. Minakên van sînardarkirinan ev in: cudakirina mayînde ya girtiyên din ên li girtîgehê, kelebçekirina destên wan her gava ku ji hucreyê tîn derxistin, astengkirina danûstandina bi girtiyên din re û sînardarkirina mafên serdanê. Li gorî CPTyê ti hincetek nîn e ku sînardarkirin bi awayekî bêferq li hemû girtiyên bi heman sizayî ragirtî werin sepandin bêyî ku li riska takekesî ya ku girtî pêk tînin (an pêk nayînin) were mêzêkirin. Girtibûna demdirêj dibe ku li ser girtiyan bibe sedema bandorên cihêreng ên dîrketina ji civakê. Girtiyên demdirêj ji bilî girtibûna xwe, dibe ku ji ber gelek şertên psikolojîk ên cuda (jîdestdayîna baweriya bi xwe û xirabûna şîyanên civakî) rû bi rû bimînin û di encamê de, piraniya wan dibe ku meyla wan zêde bibe ku ji civakê zêdetir bi dûr bikevin. Li gorî nêrîna CPTyê, divê pratîk û xebatên ji bo girtiyên bi sizayên demdirêj sizakirî wisa werin sêwirandin ku van bandoran bi awayekî erênî û proaktîf siviktir û telafî bike.

Ev belgeyên navneteweyî diyar dikin ku divê girtî di mercên wisa de bîn ragirtin ku tendurîstiya wan a fizîkî û psikolojîk bê parastin û ev belge dîsa misoger bikin ku mercên girtiyên bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî sizakirî jî divê bêyî tu cudakarî bê kirin li gorî mafên mirovan bin. Lê belê, birêkûpêkkirinên yasayî yên ku mafê hêviyê binpê dikin, hem di wan de tu guhartin nehatine kirin hem jî kiryarên cihêkar ên ku bêyî tu hincetêke yasayî li ser van girtiyan tîn sepandin jî berdewam dikin.

“Hemû kesên ku ji azadiya xwe bêpar hatine hiştin, mafê wan ê miamelêyeke
mirovane û rêzgirtina li rûmeta mirovan heye ku ev mafekî zikmakî ye.”

- Peymana Mafên Medenî û Siyasî

Beşa Pêncem

GIRÊDARÎ Û SEPANDINA BIRYARÊN DMMEYÊ YÊN DI HIQÛQA NAVXWEYÎ YA TIRKIYÊ DE

Wekî aliyekî Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê, Komara Tirkîyeyê erka darizandinê ya DMMEyê qebûl kiriye. Peyman di sala 1950yî de ji bo îmzekirinê hatiye vekirin û di sala 1953yan de ketiye meriyetê. DMME hatiye damezrandin ji bo çavdêrikirina pabendbûna dewletên îmzekar bi Peymanê re. Tirkîyeyê di 4ê mijdara 1950yî de Peyman îmze kiriye û bi Qanûna hejmar 6366an a 10ê adara 1954an ew pesend kiriye.

Her çend ku mafê serilêdana takekesî ya ji bo

prosedura venêrinê ya Dadgehê û erka darizandina mecbûrî ya DMMEyê di demên cuda de hatibin qebûl kirin jî, pejirandina ji aliyê Komara Tirkîyeyê ve ya mafê serilêdana takekesî ji bo Dadgehê, bi qebûlkirina Protokola pêvek a bi hejmara 11an a Peymanê pêkan bûye di sala 1997an de. Bi vê Protokolê, ku di sala 1997an de hatibû qebûl kirin, erka darizandinê ya Dadgehê bi awayekî mayînde hatiye naskirin. Ev Protokol di Rojnameya Fermî ya hejmar 23025 a 20ê hezîrana 1997an de hatiye weşandin û di 1ê mijdara 1998an de li

Tirkiyeyê ketiye meriyetê.

Li gorî xala 90(5) a Destûra Bingehîn a Komara Tirkiyeyê, peymanên navneteweyî yên bi usûla pêwîst ketî meriyetê di hikma qanûnan de ne. Peymanên navneteweyî yên têkildarî maf û azadiyên bingehîn in û bi usûla pêwîst ketine meriyetê, eger di navbera wan û qanûnan de li ser heman mijarê hikumên (ramanên) ji hev cuda hatibin diyarkirin, hingê di çareserkirina van nakokiyan de hikumên peymanên navneteweyî serwer in û ew esas tên girtin.

Di sepanî de, li cihê ku nakokiyek di navbera hikumên qanûnekê û hikumên peymanê navneteweyî ya têkildarî maf û azadiyên bingehîn de hebe, divê hikumên peymanê esas werin girtin. Ev rêgez rêgezeke îlgayê ya zimnî ye û wisa jî qabiliyeta hikumên wan qanûnan ji holê radike, yên ku bi hikumên peymanên navneteweyî yên têkildarî maf û azadiyên bingehîn re ne lihevkerî ne (Dadgeha Destûrî, biryara Akat Ekşî (Biryara Akat Ekşî, 2013/2187, 19.12.2013, paragraf 44).

Gava ku hikuma têkildar a qanûneke navxweyî bi hikuma Peymanê re nakok be, dadgehên pileyên destpêkî ku nakokiyê çareser dikin, li gorî xala 90î ya Destûra Bingehîn, divê li ser wê hikuma qanûna navxweyî ya sedema nakokiyê na, lê li ser PMME û peymanên din ên navneteweyî yên mafên mirovan biryara xwe lê bikin. (Biryara Akat Ekşî, 2013/2187, 19.12. 2013, Pr. 45).

Biryarên DMMEyê ji bo Komara Tirkiyeyê girêdar in. Ev di Destûrê de hatiye bicîkirin. Li gorî xala 90î ya Destûrê, li gel biryara Ocalan (No. 2), ne mimkin e ku xala 107/16 a Qanûna hejmar 5275 û xala 17/3 a Qanûna hejmar 3713 bibin bingeha cîbicîkirina sizayan ji bo kesên ku sizayê hetahetayî yê giran-kirî li wan hatiye birîn.

Li gorî PMMEyê, Dewletên îmzeker ji bo her kesê ku di bin serweriya wan de ye, misoger dîkin ku maf û azadiyên di vê Peymanê de gotî nas bikin. Gava ku binpêkirineke Peymanê hebe, erka sereke ew e ku eger binpêkirin ji ber qanûnên navxweyî be, qanûn li gorî Peymanê werin sererastkirin an jî eger ji ber sepanî de be, pratîka heyî li gorî Peymanê were sererastkirin. DMMEyê diyar kiriye ku biryarên wê ne tenê ji bo çareserkirina nakokiyê taybet a li ber wê ye, lê ew bi çarçoveyê berfirehtir dihelîn ku normên Peymanê bên parastin û pêşvebirin û bi vî awayî, ew weke peymankerê payebilind alîkariya dewletan jî dike ku ew pabend û rêzdar bin li gel teahhudên xwe yên di Peymanê de. (Biryara Dadgehê, Îrlanda/Kraliyeta Yekbûyî, 18.01.1978, A25, paragraf 154; Guzzardi/Îtalya, 06.11.1980, A39, Pr. 86).

DMMEyê cext lê kiriye ku, li gorî xala 46an a Peymanê, dewletên îmzeker di çarçoveya biryarên DMMEyê yên der heqê serilêdanan de ku aliyekî wan dewlet in, ev dewlet binbar in ku bi biryarên DMMEyê re pabend bin (Del Rio Prada/Spanya [BD], B. No: 42750/09,

21/10/2013, Pr. 137).

Li gorî DMMEyê, eger ew bi xwe bînpêkirinekê tesbît bike, dewleta dozlêkirî ne tenê berpirs û binbar e ku tezmînata di xala 41an a Peymanê de gotî bide, lê her wiha berpirs û binbar e ku di hîqûqa navxweyî de ji bo jîholêrakirina bînpêkirinê tedbîrên takekesî û/yan jî eger hewce bin, tedbîrên gelemper bistîne û bandorên bînpêkirina behsa xeberê bi awayekî wisa qerebû bike ku kesa/ê serîlêder bîne ser rewşa herî nêzîk a berî rûdana bînpêkirinê û berî bînpêkirina Peymanê (Del Rio Prada/Spanya, Pr. 137).

“Girtî, bi qasî ku îmkan rê didin, ji mal an cihên wan ên başkirina
civakî nêzîk tên bicîkirin.”

-Rêzikên Mandela

Beşa Şeşem

RENGVEDANÊN BIRYARÊN DMMEYÊ Û PÊVAJOYA VENÊRÎNÊ YA BERDEWAM A KOMÎTEYA WEZÎRAN LI SER HIQÛQA NAVXWEYÎ YA TIRKIYEYÊ

Biryarên DMMEyê girêdar in; lê belê sepan-din ji aliyê Komîteya Wezîran ve tê venihartin û çavdêrkirin. Piştî biryarên di dozên Ocalan (No. 2), Kaytan, Gurban û Boltan de sepan-dina van biryaran hildaye çarçoveya venihartina zêdekirî. Komîteyê ji bo van biryarên ku weke Komebiryarên Gurban jî tên binavkirin, bi israr pêkanîna reformên qanûnî û dezgehî yên şênber xwestiye. Lê belê planên xebatê yên Tirkiyeyê yên ku heta niha pêşkêş kirine wekî dubarekirina mewzûata heyî bûne; di van de ne nexşerêyek ne jî mekanîzmayeke rêvîzekirinê (nirxandinê) ya fonksiyonel hatiye pêşkêşkirin. Komîteyê gelek caran ev kêmasî dane tomarêkirin û ji Tirkiyeyê xwestiye ku statîktîkên bihûrgilî jî tê de daneyên şênber bide.

Di pêvajoya li ser biryaran de ku li civînên Komîteyê yên 1419. (2021) û 1507. (2024) hatibûn wergirtin, bi taybetî ev xal balê dikişînin:

- Kesên ku ji ber Qanûna Dijeterorê û sizayên din ên giran sizadar bûne ku di Qanûna Sizayî ya Tirkiyeyê de hatine ravekirin, bi tevahî ji berdana bimerc tên vederkirin û ev yek bi awayekî eşkere ne li gorî pêşîneyên dadgehî yên DMMEyê ye.
- Desthilatê tu gav neavêtine ku mekanîzmayeke serbixwe û di bin çavdêrî û nirxandina darazî de ava bike ku rewşa girtiyan a takekesî û pêşketina wan a di pêvajoya înfazê de bide ber çavan.

• Tevî ku rejîma sizayê girtîgehê yê girankirî ya bêyî derfeta nîrxandina jinûve ji aliyê vegiriyê (şumûlê) ve pir berfireh e û raporên serbixwe nîşan didin ku ji 4.000î zêdetir girtî dibe ku di vê rewşê de bin, sazî, dezgeh û rayedarên Tirkîyeyê daneyên Komîteyê xwastî nekarîne bo wê peyda bikin û vê yekê jî nebûna şefabûnê kûrtir kiriye.

Ji ber ku Tirkîyeyê tevî derbasbûna demê jî tu tedbîr negirtine, Komîteyê pêvajoya venîhartin/çavdêriyê ya der barê Tirkîyeyê de bi Biryareke Demkî ya awarte ya bi dîroka 17ê îlona 2025an û hejmara CM/ResDH(2025)264, aniye asteke nû.

Di çarçoveyê de li ser pêvajoya çavdêrî/venîhartinê ya Komîteyê ev tişt dikarin bîn gotin:

- Nebûna mekanîzmayeke nîrxandinê di rejîma sizayî ya hetahetayî ya girankirî de weke pîrsgirêkeke avasaziyî ya berdewam hatiye pê-nasekirin.

- Biryarên DMMEyê yên di dozên Vinter, Ocalan (No. 2), Kaytan, Gurban û Boltan de û minakên erênî yên ji dewletên endamên Konseya Ewropayê standardên referansê ne ji bo Tirkîyeyê.

- Bi taybetî, pêdiviyên herî kêr ev in ku divê herî dereng di nav 25 salan de carekê nîrxandinek / çavdêrîkirinek were kirin, ev divê bi navberên birêkûpêk were dubarekirin, divê mekanîzmayeke vekolinê ya berdest were damezrandin ku serbixwe, bêalî û di bin çav-

dêriya darazê de be, divê rewşa taybet a her girtiyeke/ê were nîrxandin û divê garantiyên usûlî werin peyda kirin.

Biryara Komîteyê her wisa nêzikatiyeke li gorî danezanên li ser Rêzika 9.2yê nîşan dide ku ji aliyê TLSP, ELDH, MAF-DAD û LLGyê û her wiha ji aliyê ÖHD, İHD, TİHV, TOHAV, ÇHD, CİSST û Baroya Diyarbakirê ve jî li Tirkîyeyê hatine kirin û bi vî awayî diyar dike ku tevkarîyên civaka sîvîl hatine berçav-girtin. Di van danezanên de hatiye tekez-kirin ku divê reform ne tenê bi 'damezrandina mekanîzmayekê' bê sînordarkirin, lê divê ew mekanîzma bibandor û berdest be.

Biryara demkî Tirkîyeyê mecbûr û binbar kiriye ku heta hezîrana 2026an der barê gavên şênber ên ku hatine avêtin de raporekê bide. Di encamê de, zexta demê li ser Tirkîyeyê zêde bûye û hatiye eşkerekirin ku dê encamên di asta siyasî û navneteweyî de girantir bibin.

Di dawiyê de, ev biryara demkî ji bo Tirkîyeyê xaleke werçerxê temsîl dike. Eger reform neyên çibîckirin, dê were piştrastkirin ku pêşîneyên dadgehî yên DMMEyê bi awayekî sistematîk tên binpêkirin. Rewşeke wiha dê zemînekê amade bike ku Tirkîye hem di nav Konseya Ewropayê de hem jî li qada navneteweyî rastî riskeke zêde ya îzolasyonê were.

“Hincet çi dibe bila bibe, nabe ku girtî rastî îşkence, miamela yan
sizayê zalimane, nemirovane yan jî biçûkker werin.”

- Rêzîkên Mandela

Beşa Heftem

PIRSGIRÊKÊN DI SEPANDINÊ DE: DESTHEYÊN RÊVEBERÎ Û ÇAVDÊRIYÊ

1. Destpêk

Li Tirkîyeyê sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî ne tenê bi metnên qanûnan, her wiha bi sepandina rejîma înfazê û rêveçûna pergala berdana bimerç, ji bo mafê hêviyê bîpirsgirêk e. Ji bo girtiyên ku bi “sûcên terorê û yên li dijî nîzama destûrî” bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatine sizakirin tu îhtimala berdanê tune ye, lê belê girtiyên ku ji ber sûcên din bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî yan jî sizayê girtîgehê yê hetahetayî hatine sizakirin, piştî demeke diyarkirî îhtimala berdanê ji wan re heye. Lê belê, dirêj-kirina sizayan ji bo girtiyên di vê kategoriyê de, ku ji aliyê destheyên rêveberî û çavdêriyê

ve tê biryardan, ji bo jiyana wan bûye rewşeke “hilweşandina hêviyê”.

Yek ji dezgehên herî giring di sîstema sizayî ya Tirkîyeyê de ku rasterast bandorê li ser pêvajoyên înfaza sizayên girtiyan dike, Destheyên Rêveberî û Çavdêriyê ne. Ev destê bi betalkirina Rêzîknameya Navendên Çavdêrî û Senifandinê ya di Rojnameya Fermî ya 17ê hezîrana 2005an û bi hejmara 25848an weşandî û danîna Rêzîknameya Navendên Çavdêrî û Senifandinê û Nirxandina Girtiyan li şûna wê hatiye avakirin ku ev rêzîkname jî di 29ê kanûna 2020an de di Rojnameya Fermî de hatiye weşandin û di 1ê çileyê 2021an de ketiye meriyetê.

Xalên li ser “navendên çavdêrî û senifandinê” yên di xala 13an a Qanûna hejmar 5275an a Der barê Înfaza Siza û Tedbîrên Ewlehiyê de û xalên li ser “nirxandina girtiyan û diyarkirina reftarên baş” ên di xala 89an de bingeha wê ya yasayî pêk tînin.

Armanca rêzîknameyê di beşa yekem de wiha hatiye ravekirin: “hikumên têkildarî çavdêrî û senifandina girtiyan, şandina wan bo saziyên guncayî yên li gorî rewşa wan û birêvebirina nirxandinên başbûn an başnebûna reftarên wan li ser bingeha çalakiyên rehabilitasyonê yên ku hatine pêkanîn û helwest û tevgerên wan di nava xwe de dihevine.” Bi gotineke din, ev desteya ku xwedî rayeyên berfireh e û ji kêliya hatina girtîgehê hetanî berdana wan di tevahiya projeya girtiyan de diyarker e, tenê bi rêzîknameyekê hatiye avakirin.

2. Avasaziya Desteyê û Rêveçûna Wê

Li gorî Rêzîknameyê, serokatiya desteyê ji aliyê gerîndeyê girtîgehê ve tê kirin û piraniya endamên wê ji karmendên îdarî pêk tê, ku di nav de cîgirê gerînde, karmendê îdarî, bijîşkê girtîgehê, psîkiyatr, psikolog, xebatkarê civakî, mamoste, serkarmendê înfazê û parastinê yê girtîgehê û peywardarekî ji nav karmendên teknîkî hîlbijartî hene (Rêzîknameya Birêvebirina Saziyên Sizayî, xala 22yem).

Ji bilî vê avasaziyê, ji bo nirxandina bicihkirina li girtîgeha vekirî, înfaza sizayî ya bi tedbîrên serbestiya di bin çavdêriyê de û berda-

na bimerc a “kesên ku bi giştî bi deh salan an zêdetir sizayê girtîgehê hatine sizakirin û kesên ku bi sûcên terorê, sûcên damezrandin, birêvebirin an endamtiya rêxistinekê, sûcên di çarçoveya çalakiyên rêxistinî de hatine kirin, sûcên kuştina qestî, sûcên li dijî yekpareyiya zayendî û sûcên têkildarî amadekirin û bazirganiya madeyên hişbir û hişyarker hatine sizakirin” her wiha hatiye diyarkirin ku Serdozgerê/a Komarê yan jî Dozgerê/i ji aliyê wê/wî ve hatî diyarkirin dê serokatiya Desteya Rêveberî û Çavdêriyê bike (Qanûna Înfazê, xala 89/3).

Yek ji taybetmendiyên herî balkêş ên vê Desteyê ew e ku ev Desteya Rêveberî û Çavdêriyê xwedî wê rayeyê ye ku hem bandorê li wan mafan bike ku girtî dikarin li tevahiya dema xwe di girtîgehê de jê mifadar bin hem jî nirxandinên wan rasterast bandorê li dîroka berdana girtiyan dikin, lê tevî vê yekê jî ev destê bi giranî ji karmendên girtîgehê pêk tê. Her çend qanûn ku diyar dike ku Dozgerê Komarê dikare di hin mercên sînordar û awarte de tevî vê pêvajoyê bibe jî, ev destê bi giştî tenê ji karbidestên girêdayî rêveberiya girtîgehê pêk tê û ev rastî jî nîşan dide ku béalibûn û serxwebûna vê desteyê nikare were garantîkirin.

3. Nirxandina Reftarên Baş

Fonksiyona herî krîtîk a desteyan nirxandina reftarên baş e, ku rasterast bandorê li ser pêvajoyên berdana girtiyan dike. Di Rêzîknameyê de ev nirxandin xwe dispêre ser krî-

terên wekî pabendbûna bi rêzikên girtîgehê, bikaranîna mafên xwe bi niyeta baş, pêkanîna berpirsiyariyan, beşdarbûna di bernameyên perwerdehî û rehabilitasyonê de, çalakîyên civakî û çandî, hebûna xeysetê xwendina pirtûkan, têkiliyên bi karmendên girtîgehê re, poşmanî, xelatên wergirtî û sizayên disîplîne (Rêzîknameya Navendên Çavdêrî û Dabeşkirinê, xala 3.).

Piraniya van krîteran esasen nezelal û subjektîf in. Bi taybetî, pîvana 'poşmantî' yê di hiqûqa înfazê de cih nagire. Her çend ku 'poşmantîya kartêker' wekî bingehek ji bo kêmkirina sizayê di qonaxa darizandinê de (Qanûna Sizayî ya Tirkiyeyê, xala 168an) hatibe destnîşankirin jî, di hiqûqa înfazê de tu tiştekî wiha tune ye.

4. Pîrsgirêkên Hiqûqî

Pîrsgirêkên hiqûqî yên sereke di heqê Desteyên Rêveberî û Çavdêriyê de ev in:

- Pîrsgirêka Objektîfbûn û Bêalîbûnê: Ji ber ku piraniya desteyê ji karmendên girtîgehê pêk tê, rayeya sepandina sizayên disîplîne û nirxandina reftarên baş di destê heman kesan de ye.
- Nebûna diyarbûna hiqûqî: Ji ber pîvanên nezelal, girtî nikarin ji pêş de pêşbînî bikin ka kîjan ji reftarên wan dê bandorê li ser serbestberdana wan bike.
- Dûrbûna ji venêrîna darazî: Deste bi awayekî fiilî wekî dadgehan tevdigerin ji bo bir-

yardayîna li ser berdana bimerç, lê çavdêrî û venêrîna serbixwe ya dadgereke/î tê de tune ye.

- Bînpêkirina qedexeya cudakariyê: Heman reftar ji aliyê desteyên cuda ve dikarin cuda werin şîrovekirin, kêfîtiya di sepandinê de, ev hemû dikin ku di encamê de girtî li gorî sûcê xwe û sizayê li wan sepandî rastî cudakariyê bîn.

5. Encamên di Sepandinê de

Di pratîkê de ji ber biryarên neyînî yên van desteyan berdana gelek girtiyan tîn astengkirin û ev yek jî bi rêya parêzer, baro û saziyên sîvîl bo raya giştî tê daxuyandin. Her wisa, ev sedemên kêfî yên astengkirinê jî ji ber hincetên absurd derdikevin holê. Eger em ji van çend mînakên bidin ku di çapemeniyê de jî derketine, hincetên wekî girtî çi qas ev bi kar aniye, girtiye ku dûrî bajarê malbata xwe tê ragirtin, jê re dibêjin malbata te nayê serdana te, girtî ji pirtûkxaneyê çend pirtûk hildane, kêmbûna enerjîya jiyanê ya girtî ji bo astengkirina berdana girtiyan weke bingehek tîn nîşandan.

Her wiha ji ber Gerînendetiya Gerînendetiya Giştî ya Saziyên Sizakirinê û Girtîgehan daneyên fermî êşkere nake, nayê zanîn ka çend kes tûşî vî tiştî bûne.

6. Pêşniyar

Desteyên Rêveberî û Çavdêriyê bi vî halê xwe yê heyî organên wisa ne ku bi biryarên bêyî

bingeheke hiqûqî, ne qabilî pêşbînîkirinê kêfî azadiya girtiyan sînordar dikin. Ji ber vê yekê:

- Di sizayên girtîgehê yên demdiyarkirî de berdan divê bi biryarên îdarî ne, bi garantiyên darazî bîn diyarkirin.

Rayeyên biryardayînê yên Desteyên Rêveberî û Çavdêriyê, yên ku rê didin wan ku li ser bingeha nîrxandinên kêfî û nezela pêvajoya berdanê asteng bikin, divê bîn reformkirin; nîrxandinên der barê berdanê de yên girtiyan bi sizayên demdiyarkirî divê ne karûbarên van desteyan bin. Divê ew sepanî bîn rakirin ku dibin sedem ku girtiyan bi sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî hatî sizakirin 'hetanî dawîya emrê xwe' di girtîgehê de bîn ragirtin û divê sistemeke înfaza sizayan were pejirandin ku 'mafê hêviyê' yê girtiyan misoger dike.

- Li şûna van desteyan, ku bûne mekanîzmayeke bînpêkirina mafên girtiyan ên azadî û ewlehiyê, divê prosedûrên berdanê yên girtiyan di bin venihartin / çavdêriya darazî de û ji aliyê dadgehan ve bîn parastin û misogerkin.

- Avasaziya van desteyan divê ji binî ve bê guhartin û beşdariya hiqûqnasên (pisporên hiqûqê) yên serbixwe divê bê misogerkin.

- Krîterên ji bo reftarên baş divê zelal, diyarkirî û qabilî pîvandî bin.

- Bîyar divê bîn şefakirin û daneyên statîstîkî divê bi raya giştî re bîn parevekin.

- Ev deste divê bibin organên ku mafên berdana bîmerc ên girtiyan hêsan dikin, ne ku wan asteng dikin.

Weke encam, bi halê xwe ya heyî Desteyên Rêveberî û Çavdêriyê hem nehiqûqîbûn hem jî cudakariyê diafirînin û ne li gorî pêwîstiyên mafê azadî û ewlehiya kesên in. Halê hazir, pêdivî pê heye ku avasaziya Desteya Rêveberî û Çavdêriyê bi temamî were sererastkirin; li şûna ku rê li ber berdana girtiyan bigirin, divê veguherin mekanîzmayeke navbeynkar ku bi awayekî piştgiriyê dide 'mafê hêviyê' yê girtiyan, li gorî pêwîstiyên mafê hêviyê berdana wan hêsan dike.

Ev rapor nîşan dide ku rejîma girtîgehê ya sizayê hetahetayî yê girankirî li Tirkîyeyê ne tenê pîrsgirêkeke mafên mirovan a takekesî ye, lê veguherîye pîrsgirêkeke avasaziyî û ev rejîm li rûmeta mirovan nayê. Ev sistem, ku piştî rakirina sizayê mirinê weke gaveke ber bi pêş ve ji bo mafên mirovan hatibû pêşkêşkirin, di pratîkê de bûye rejîmeke bêhêvîtiya heta hetayê. Bi lêkolîna li ser mafê hêviyê ya ji aliyê bingehên wê yên têgihî, dîrokî û hiqûqî ve rapor nîşan dide ku pratîka li Tirkîyeyê bi awayekî sistematîk vî mafî bînpê dike.

“Divê ev rejîm rê bide hemû girtiyan ku bi qasî ku ji bo têkiliyeke
mirovî û civakî ya têrker pêwîst e, li derveyî odeyên xwe wext derbas
bikin.”

- Rêzikên Girtîgehan ên Ewropayê

Beşa Heştem

ENCAM

Wekî ku di beşa destpêkê de hatibû diyarkirin, mafê hêviyê ne tenê ihtimala ji nû ve bidestxistina azadiyê ye; ew mafê parastina pêwendiya mirov a bi siberojê re û şiyana wan a ji bo guherîn û ji nû ve entegrebûna nava civakê ye. Li gorî vê perspektîfê, mafê hêviyê sînorekî etîkî datîne ser fonksiyona sizayî ya qanûnê. Dewlet nikare kesekî li ser bingeha kiryarên wê/wî yên berê heta hetayê mehkûm bike; ew her wiha mecbûr e ku potansiyela wê/wî ya ji bo siberojê jî li ber çavan bigire. Wekî ku di raporê de hatiye diyarkirin, ev maf beşeke yekpare ya prensîba rûmeta mirovan e û qebûl dike ku hebûna mirovekê/i ne tenê bi kiryarên wê/wî yên berê, lê her wiha bi potan-

siyela wê/wî ya ji bo siberojê jî pêk tê.

Di hiqûqa navneteweyî de, ev prensîb rehên wê li ser xala 3yem a Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê (qedexeya mîameleya nemirovane û biçûkker) qahîm bûne û bi cih bûne. Pêşîneyên dadgehî yên DMMEyê wekî di dozên Kafkaris, Vinter, Murray, Matioşaitis, Petukhov û Marcello Viola de hatiye danîn, destnîşan kiriye ku sizayên hetahetayî tenê dikarin bi şertekî bi rûmeta mirovan re lihevhatî werin hesibandin; ew jî heke ew hem di qanûnê de (de jure) hem jî di pratîkê de (de facto) bînin guhartin. Li gorî Dadgehê, eger tu îmkanek tune be ku kesek di bin çî şert û mer-

cî de be jî were berdan, ev yek tê wateya înkarkirina şîyana wan a guherînê û sînodarkirina kesayetiya wan tenê bi rabirdûya wan ve.

Ji ber vê yekê, jî nû ve nixandina sizayan divê herî dereng di nava 25 salan de bê destpêkirin, bi periyodên birêkûpêk bîn dubarekirin û pêşketina takekesî ya kesan û girêdanên wan ên bi civakê re divê li ber çavan bîn girtin.

Di rewşa Tirkiyeyê de biryarên di dozên Ocalan (No.2), Kaytan, Gurban û Boltan de blokeke pêşîneyên dadgehî yê zelal û rûniştî hene û nişan didin ku rejîma sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî mafê hêviyê jî holê radike. Dadgehê tesbît kiriye ku mekanîzmayên bêyî derfeta berdena bimerç an jî yê tenê di teoriyê de heya xala 3yem a Peymanê binpê dikin û efûya serokkomariyê jî nikare şûna nixandineke / venihartineke birêkûpêk, berdest û serbixwe bigire. Vê tesbîtê nişan daye ku pirsgrêk ne yeke takekesî ye, lê yeke avasaziyî û pergali ye.

Komîteya Wezîran a Ewropayê di çavdêrî û venêrîna xwe ya di çarçoveya Koma Gurban de li ser Tirkiyeyê hin nixandinan dike û daxwaza reformeke berfireh dike ji bo çareserkirina van pirsgrêkên avasaziyî û pergali. Komîteyê diyar kiriye ku bi taybetî xala 107/6 a Qanûna der barê Înfaza Sîza û Tedbirên Ewlehiyê ya hejmar 5275 107/16 û sepandinên di çarçoveya wê de mafê hêviyê bi awayekî fîlî jî holê radikin; jî Tirkiyeyê xwestiya ku pergaleke nixandinê û berdana bimerç a li gorî

standardên DMMEyê ava bike. Tevî vê yekê jî Tirkiyeyê gavên pêwîst neavêtine.

Beşa raporê ya hiqûqa berawirdkirî û mînakên sepandinê destnîşan dike ku li piraniya welatên endamên Konseya Ewropayê

piştî demeke diyarkirî mekanîzmayeke serbixwe û darazî ya nixandinê heye. Li van welatan sizayê girtîgehê yê hetahetayî nayê wateya bêhêvîbûna hetahetayî; ev bi pêvajoyên ku kapasîteya guherîna kesan û jî nû ve vegera wan a li nava civakê tîn hevsengkirin. Di gel vê yekê, rejîma înfazê ya sizayê girtîgehê yê hetahetayî yê girankirî li Tirkiyeyê hem bêyî berdana bimerç hem jî bi awayekî li dijî rûmeta mirovan berdewam dike. Tecrîda demdirêj, nixandinên kêfî yê "refstarên baş" û sepandinên neşefaf hê jî berdewam in û avasaziyekê diafirînin ku rûmeta mirovan a girtiyan diêşînin û tîkiliyên wan ên bi civakê re qut dikin.

Dema ku li gel hejmara girtiyan ku di bin vê rejîmê de ne tê nixandin, ev tablo nişan dide ku mafê hêviyê li Tirkiyeyê ne tenê mijareke takekesî ye, lê di heman demê de veguheriya mijareke demokratîk û civakî jî. Ji ber ku civak tenê bi qasî ku kesên tê de baweriya xwe ya bi siberojê biparêzin, demokratîk e. Sîstemê meke hiqûqî ya ku hêviyê jî holê radike, ne tenê girtiyan lê civakê jî radestî bêhêvîtiyê dike. Armanca hiqûqê ne tohildan e, lê edalet û parastina ihtimalên tîkildarî mirovan e.

Di vê çarçoveyê de gavên ku divê Tirkiye

biavêje zelal in. Ji bo ku mafê hêviyê li gorî pêşîneyên DMMEyê û standardên Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê bê parastin û misogerkirin:

- Di sizayên girtîgehê yê hetahetayî yê giran-kirî de piştî demeke diyarkirî mekanîzmeyeke nirxandinê ya serbixwe, şefaf û birêkûpêk divê were avakirin;
- Ji bo berdana bimerç bi awayekî bêistîsna ji bo hemû girtiyan bê naskirin û misogerkirin;
- Mercên înfazê yên li ser bingeha tecrîdkirinê avabûyî divê bîn rakirin û mercên jiyânî yên li gorî rûmeta mirovan bîn peydakirin;
- Daneyên înfazan û girtiyan divê bi awayekî birêkûpêk û berdest bi raya giştî re bê pareve-kirî û bi vî teherî venihartin û çavdêriya civakî û binbaryên navneteweyî divê bîn bicihanîn.

Ev gav ne tenê ji ber biryarên DMMEyê pêwîst in, her wiha ezmûnek in ji bo xwedîlêderketina Tirkiyeyê ya li angaştê xwe ya dewleta hiqûqî jî. Mafê hêviyê prensîbek e ku pîvana mirovanebûna sizayê diparêze û wijdana hiqûqê temsîl dike. Pergaleke ku wê ji holê radike taybetmendîya kesana mirovbûnê înkâr dike; civak jî di vê rewşê de şûna edaletê bi bêçarebûnê tijî dike.

Weke encam, ev rapor mafê hêviyê ne tenê weke têgih û termeke hiqûqî, lê ji bo berdewamiya mirovahiyê û demokrasîyê weke

prensîbeke jênegêr diparêze. Ji ber ku mirov bi qasî ku dikare der heqê siberojê de xeyalan bike mirov e; ev xeyal çî qasî pêkan bin, civak jî ew qasî adil û dadmend e. Rejîmeke ku hêviyê qedexe dike, rûmeta mirovan jî qedexe dike. Ji ber vê çendê misogerkirina mafê hêviyê pêşşertek e hem ji bo parastina rûmeta mirovan hem jî ji bo parastina siberoja demokratîk a Tirkiyeyê.

- Abduloğlu, Z., & Bayramoğlu, F. (1997). Uyku ve uyku bozuklukları. Genel Tıp Dergisi, 161.

“Mercên der heqê ronahî (vêxistina çirayê), hewadarkirin, germkirin, tenduristî, xwarin û vexwarin, ava vexwarinê, îmkana xwegihandina bi cihekî servekirî û derfeta egzersîzên fîzîkî, îmkanên paqijî û hijyena şexsî, xizmeta tenduristiyê û qadeke şexsî ya têrker de jî tê de hemû mercên giştî yên jiyanê yên di van rêzikan de behs kirî ji bo hemû girtiyan bê îstîsna tên dabînkirin.”

-Rêzikên Mandela

ÇAVKANÎ

- Ceza İnfaz Sisteminde Sivil Toplum Derneği (CİSST). (2024, 18 Kasım). Ulusal ve uluslararası mevzuat ışığında umut hakkı.
<https://cisst.org.tr/ulusal-ve-uluslararası-mevzuat-isiginda-umut-hakki/> (Erişim tarihi: 12 Ocak 2026)
- Ceza ve Güvenlik Tedbirlerinin İnfazı Hakkında Kanun (Kanun No. 5275). (2004, 13 Aralık).
- Ceza İnfaz Kurumlarının Yönetimi ile Ceza ve Güvenlik Tedbirlerinin İnfazı Hakkında Yönetmelik. (2020, 28 Mart).
- Council of Europe, Committee of Ministers. (2014). Recommendation CM/Rec(2014)3 on life sentences.
- Council of Europe, Committee of Ministers. Türkiye'ye ilişkin bütünlük izleme raporları ve Öcalan ve diğer Türkiye davaları bağlamında AİHM ihlallerinin uygulanmasına ilişkin izleme kararları.
- Ekici, G., Savaş, H. A., & Çıtak, S. (2001). İntihar riskini artıran psikososyal etmenler. Anadolu Psikiyatri Dergisi, 2(4), 204–212.
- European Court of Human Rights (ECHR). Öcalan v. Turkey (No. 2).

- Galliani, D. The reducible life imprisonment standard from a worldwide and European perspective.
- Gözlem ve Sınıflandırma Merkezleri ile Hükümlülerin Değerlendirilmesine Dair Yönetmelik. (2020, 29 Aralık).
- James, N., Butcher, J., & Mineka, S. (2013). Anormal psikoloji. İstanbul: Kaknüs Yayıncılık.
- Kring, A., Johnson, S., Davison, G., & Neale, J. (2019). Anormal psikoloji.
- Meckled-Garcia, S., & Çaltı, B. (Eds.). (2006). The legalization of human rights: Multidisciplinary perspectives on human rights and human rights law. Routledge.
- Trotter, S. (2022). Hope's relations: A theory of the "right to hope" in European human rights law. Human Rights Law Review.
- Tuğlu, C., & Şahin, Ç. (Yıl bilgisi yok). F tipi yaşamlar: Ceza içinde ceza – insan, tecrit, izolasyon. HFSA, 351.
- Türk Ceza Kanunu. (2004, 26 Eylül).
- Van Zyl Smit, D. Life imprisonment and the right to hope.
- Vannier, M. Hope as illusion: The European right to hope and the realities of ageing behind bars.
- Özgürlük İçin Hukukçular Derneği (ÖHD). (2025). Umud hakkı bülteni.

Adress

Foundation for Society and Legal Studies (TOHAV)
Kuloğlu Mah. Turmacıbaşı Cd. Fikret Tuner İş Hanı
No:39 K.3 Beyoğlu / İstanbul

Contact

www.tohav.org.tr
info@tohav.org.tr



TOHAV
Toplum ve Hukuk Araştırmaları Vakfı
Foundation for Society and Legal Studies